




TEKOŞER

Hejmar 26

Kanûn 1984



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TÊKOŞER: KOVARA TÊKOŞER, YEKÎTIYA KARKER Û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: TÊKOŞER
B.P. 33
1730 ZELLIK
BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

ABONETİ: 160 F.B.

Nº BANKÊ: 426-3144071-85
K. B.
BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezih YALÇIN

KOMİTA NIVİSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

KARÊN TEKNİKÎ: Pascale DESRUMAUX

TÊDAYÎ

DIVÊ KU EM NIVİSKARAN BIGHÎNIN	Dr. Poloço	R. 3
CIGERXWÎN ÇÛ DILOVANIYÊ	Mihdî	R. 4
COGRAFYA KURDISTANÊ DI ANSÎKLOPÊDIYA ISLAMÊ DE	R. 6
STRANEK GELERÎ: XERABO	R. 12
DEPREMA ERZURÛMÊ	Bira	R. 13
TÊGIHEŞTINA ÇIROKÊN GEL	Torf	R. 15
INLEYEREK AKIYOR DICLE İLE FIRAT	Bira	R. 19
KURDISTAN, ÇEND NOT LI SER JÎNA ABORÎ Û ÇANDÎ	Pervîn	R. 21
XEWNA NE BI XÊR	Firat Cewerî	R. 23
DÎROKA KURD Û KURDISTAN	Derwêş	R. 24
HEVPEYVÎNEK BI Dr. QASIMLO RE	R. 26
KONSERÂ KURDİ-TIRKÎ LI BRUKSEL	R. 28
BRÜKSEL'DE KÜRT-TÜRK KONSERİ	R. 29
SERBUHURIYEK BI YILMAZ GÜNEY RE	Torf	R. 30
XEBATA ME	R. 32
KUŞTINA KARKERÊN KURD Û TIRK LI FRANSÂ	R. 33
TÊKOŞER'DEN HABERLER	R. 34
AVRUPAYA DINI GOÇ	Yalçin	R. 35
HEVPEYVÎNEK	Derwêş	R. 36

DIVÊ KU EM NIVİSKARAN BİGHİNİN

Dr. Poloço

Dibe ku ev sernava jorfin pirsinan di serê hinan debihêle. Ew karin wilo bipirsin: "Ma ku nivîskar tunebin, emê çawan nivîskaran bîghînin û derbixînin?". Rast e, divê ku tiştek di ortê de hebe, ku mirov karibe wî tiştek bi pêş de bibe û bîghîne. Lê ê me, me heya bi niha guh nedaye vê yeka han. Xort ji nav me derketine, nivîsîne, kal bûne û mirine jî, me bi qasî qırşekî guh neda ye wan, piştgirtiya wan nekirine û ew her bi serê wan û bi tenê hîstine. Ji dêlva ku em piştgirtî û alîkariya wan bikin, me dev avetiye wan û ew nebaş nîşan dane. Hfn jî çend heb ji xor-tân me yêñ wê demê dijîn. Van xor-tân me yêñ wê demê, ku niha kalbûne û li bendî mirina xwe rawestane, gelo ku bimirin û ji nav me bar bikin, ka ewê ji me re çi bîhêlin? Ka wan bi çendan roman, çîrok, piyes û hwd... nivîsîn? An ku romaneke me ya edebî, ku em karibin bidine ber romanen cîhanî, heye? An çend çîrokên me yêñ edebî, ku em karibin pê qayışe bi çîrokên cîhanî re bikşînin, hene? No, yê min ez heya bi niha tiştekî welê nabînim. Ez romaneke welê ku xwendevanen biyanî karibin pê me û jiyana me nas bikin, nabînim. Çima? Ma qey em kurd kêmî xelkê ne? Ma qey mîjiyê me weke yê xelkê bi pêş neketiye? Belê, em weke wan in û mîjiyê me jî weke yê wan bi pêş ketiye. Lê çima em dom bi nivîsandinê nakin û weke xelkê bi dehan, bi bîstan pirtükên hêja û bi naverok li dû xwe nahêlin? Gelo ev sûcê kê ye? Sûcê nivîskarê me ne, sûcê gel e, sûcê ronakbirê me ne, sûcê grûp û partiyê me ne, an jî sûcê dijminen me ne? Tu bêjî nebêjî sûcê mezin yê dijmin e. Lê grûp û partiyen me jî di vê de ne bê sûc in.

Em vegeerin ser nivîskarê me yêñ xort, yêñ dema Hawarê. Ku em li peyakî nola N. Zaza û Osman Sebrî xwedî derketibûna, dê rewşa wan niha çibiwa? Ew kabiliyeta ku di xor-tanya wan de bi wan re hebû, dê niha çiqasî bi pêş ketibiwana? Bi a min ku xwediyeñ wan hebiwana alîkarî bi wan hatibiwa kirin, xatirê wan hatibiwa girtin, kezeba wan nehatibiwa reşkirin, reklam û propaganda wan hatibiwa kirin, navê wan dê niha direx naven nivîskarê dînyayê de bi-

hata dîtin. Bi qasî ku em niha ji ber wan serbilind in, emê deh qatan serbilindtir bibiwana.

Divê ku em li nivîskarê xwe xwedî derkevin. Em ji her alî de alîkariya wan bikin. Em pirtükên wan çap bikin û belav bikin. Alîkariya wan ya diravîn bikin, moral bidine wan, propaganda wan bikin û wan bi gel bidine naskirin. Gava ku em vê yeka han ji wan re bikin, ez bawer im ku ewê ji dil û giyan binivîsin, bi gel re bibin yek û dê edebiyateke me ya hêja û nemir derkeve meydanê. Emê bi wî awayî nivîskarê hêja, ku karibin qayışe bi nivîskarê dînyayê re bikşînin, ji nav xwe derbixînin. Di virde çend gotinên Lenfîn di derheqa edebiyatê de, hate bîra min. Nivîskarekfî bi navê Aleksander Serafimovîç rojekê dihare mala Lenfîn ku wî ziyyaret bike. Piştî ku hebekî dipeyivin û sohbetê dîkin, Lenfîn jê dipirse:

- Tu vê demê li ser tiştekî dixebeitî?

Serafimovîç:

- Niha nivîsandin zor e, dema tevgerake xurt e.

Lenfîn:

- Erê, niha li welatê me dema tevgerake xurt e. Lê hun nivîskar divê ku karkeran hînfî xebatêñ xwe yêñ edebî bikin. Ji bo vê yekê divê ku hun pir bixebeitin. Her destpêkirineke karkeran fî biçûk divê ku hun karkeran jî çap dibin?

- Ne zêde, Vladimir Iliç. Divê ku em kêmasiya kultur û zanebûna wan jî bidine ber çavan.

Lenfîn bi rûkenî lê nihêrî û got:

- Lî xem nake. Ew hînfî nivîsandinê bibin û ewê edebiyateke me ya hêja û nemir pêk bê.

Lenfîn bi xwe pir guh dida huner û edebiyatê. Wî rola huner û edebiyatê di têkoşîna gelê Üris de, roleke mezin didît. Wî bi xwe edebiyat di-xwend û têkiliyê xwe get ji nivîskaran nedibirî. Di nameyêñ xwe de, yêñ ku ji nivîskaran re şandiye, dicivat û civînan de her qala girfing-bûn û hêjabûna edebiyat û hunerê kiriye.

CİGERXWİN ÇÜ DİLOVANIYÊ

Mihdi

Şervanê gelê kurd, Cigerxwîn, di roja 22yê Cotmehê, saet 03.00 de, li Swêdê, bajarê Stokholmê, çû dilovaniyê

Ji bo taziya wî, di sisiyê meha Mijdarê, roja Şemiyê, saet 12 de, di salona Tensta de, li Stokholmê, gelek kes hati bûn. Nûnerê Têkoşer ji amade bû. Di saet 12.30 de, cenaza Seyda hat anîn û herkes ji bo wî rabû piya. Piştî çend deqsan, gelek silavname ku rêxistin û merivên naskirî şandi bûn hatin xwendin. Paşê, lawê wî li ser jîna bavê xwe peyivî û nûnerên Federasyona Kurdên Swêdê û P.S.K.S. (partiyek li Kurdistana Sûriyê) axaft.

Li dawiyê, hemî kes, yek bi yek, cenaza Seyda Cigerxwîn silav kir, berê ku wê bibin meydana balefiran.

Roja Yekşemê, 4ê meha Mijdarê, cenaza wî, li ser daxwaziya wî, hat şandin bajarê Qamışlî, li Kurdistana Sûriyê.

Navê Cigerxwîn ê rast Şêxmûsê Hesen e. Ew di sala 1903 de, li Kurdistana Bakur (Tirkiyê), gundê Hesarê, qeza Kercosê, hati bû dinê. Ew yanzde salî bû dema ku çû Kurdistana Sûriyê, bajarê Amûdê. Li wê derê, piştî xwendina xwe, bû mele. Lê meletiya wî pirr ne kişand. Wî ji meletiyê zû berda û dest bi cotkariyê kir.

Şêxmûs hîn xort bû, lê wî di xortaniya xwe de, weka gelek zarokên Kurdan, gelek zorî û xizanî (feqfî) dîti bû, gund û bajarên Kurdistana Tirkiyê, İranê û Iraqê geriya bû. Kurdistana Kurdan, Kurdistana perçepçê, anî bû ber çavêن xwe. Derdê gel, derdê welêt, dil û hinavê wî dişewitandin. Ji sedema vî derdî, wî navê xwe kiri bû Cigerxwîn û bû bû mezintirînê helbestvanê geler yênelî welêt. Cigerxwîn biryar stendi bû ku heta mirina xwe xizmeta gelê xwe bike. Loma wî, heta dawiya temenê (emr) xwe, di her warî de nivîsî bû: helbest, rêziman, dîrok, nivîsarên siyasî

Ji bo ku Cigerxwîn ji nav gel derketi bû û derd û kulên wî baş zanî bû, wî bi zimanê gelê xwe dînivîsî û bangî wî dikir ku hişyar bibe, rabe piya û bibe yek. Li gora zanîna me, heta nuha heft dîwanên wî yênelî çapkirî hene û helbestên wî fro li çar aliyêن Kurdistanê, di bajar û gun-dan de, di devê mezinan, xortan û zarokan de ne. Hîn gelek eserên wî yênelî ne çapkirî ji hene.

Di sala 1927 de, wî di weşana "Xoybûn" de cih girt. Ew rêxistin yek ji rêxistinêñ gelê kurd ên yekemîn bû. Piştî çend salan, di 1930 de, Cigerxwîn û çend xortêñ welatparêz bi Celadet Bedir Xan re kovara HAWARê weşand. Ev kovara giranbuha ji sala 1932 heta 1935 û ji 1941 heta 1943 (57 hejmar), bi tîpêñ latîñî derket û li ser ziman û bêjeya kurdfî tesî-reke pirr mezin kir.

Cigerxwîn pirr caran sergom bû bû û reviya bû welatêñ din. Bi salan li Libnanê bi dizî ma. Berî 1971, wî di şoreşa Kurdistana Iraqê de cih girt. Di sala 1971 de, gava ku Kurdan mafê otonomiyê stand, wî li zanîn-geha mezin a Baxdayê mamostatiya ziman û bêjeya kurdfî kir.

Di sala 1979 de, Cigerxwîn iltica kir Swêdê û li wira jîn û xebata xwe heta dawiyê ajot. Berpirsiyaren hikûmeta Swêdê jê pişsin: "Çima te di vî emrî de welatê xwe berda û tu hatî van deran?". Bersiva Cigerxwîn ev bû: "Ez zanim ku li vê derê ezê bi serbestî karibim bi zimanê xwe bixwî-nim û binivîsim, bê ku kesek were mala min û pirtûkêm min bibe û bişewitfine".

Kîme ez ?
Kurdê Kurdistan
Tev Shoreş û volqan
Tev dînamêtîm
Agir û pêtîm
Sorim wek etûn
Agir giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya dihejî
Ev pêt û agir
Dijmin dikujî
Kîme ez ?

Ezim rojhilate
Tev birc û kelat
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ji destê dijmin :
Dijminê xwînxwar
Xurt û koledar
Ji rom, ji fireng
Di rojêñ pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast, parast
Parast min ev rojhilate
Kîme ez ?

Rojhilatê nêzîk
Rojhilatê navî
Ev bajar û gund
Ev bej û avî
Ket bin destê min
Pî da ser dijmin
Min bi ceng û şer
Zanîn û hiner
Piştâ wî şikand
Serî lê gerand
Ez bûm padîşah
Xurt û serbilind
Ketin destê min ta sînorê Hind
Kîme ez ?

Cigerxwîn

KÎME EZ

DÎWANA.. III

...1973

COGRAFYA KURDISTANÊ

DÎ ANSÎKLOPÊDİYA İSLAMÊ DE ★

- I

1. TABYET

Çiya

Bi awakî giştî, Kurdistan welitekî çiyayênil bilind e. Heykela wî, di perça wî ya tirkî de, ji zincirên Torosê Rojavayê yêni cihê ava bûye. Ev zincir, pirr zû, ji keviyêni (kenarêni) Deryayê Sipî, nêzîki Xelîcê Iskenderonê, dest bi xuyakirinê dîkin, û di pêsiyê de, ber bi Rojhilata Bakur bilind dibin. Li Bakurê Maraşê, ew çeqelekê ava dîkin. Xêza vê çeqelê ya jorîn ji destpêka çiyayêni Engirek û Nuruhakê (3090 m.) dizivîre, bi çiyayê Akra dewam dike, digihêje zincirên çiyayêni Munzur (3088m), Mercan û Kargaparaz (3.388 m.), û paşê xwar dibe, xwe bi zincîra çiyayî ya Aras digre û di dawiyê de digihêje sistema Araratê.

Ji destpêka riya me de, zincîreke duyemîn, weka nîvhîveke ku pirr baş bas xuya ye, ji Başûrê Malatyê diçe, bi çiyayêni Maden, serêni Haçres (2689 m.) û Sasûn (2.590 m.), li Başûrê Müşê, dewam dike, û di bilindbûna xwe de, bi çiyayêni Bitlis û Hekkarî (3.630 m.) û bi çiyayê Çilo ku bi serê Reşko (4.170 m.) diqede, diçe Başûrê gola Wanê.

Di nav bera van her du xêzan de, mersefa ku jê re mersefa Ermenî gotine û ku bilindbûna wê ji 1500-1000 m. nizimtir nabe cih digre. Ji xwe, zincirên ku di dirêjayıya (paralîl) kenarê Bakurê ne, weka çiyayê Çakmakê, di seviyeye bilind de dimînin. Û li Başûrê Erzurûmê jî, sistema burkanî (volkanî) ya çiyayê Palendöken (3.124 m.) û li Başûrê wî tevayiya çiyayêni Bingol û Şerafeddin û ber bi Rojhilatê bêtir, bilindiyêni Tunceli, ev kela tabîf ya Dersimê ava dîkin. Di vê kitla zinaran de, weka Krfstal, çemê Feratê newalêni kûr kolaye, û çiyayêni bi kîlekêni dijwar ji van manzerêni ku meriv nikare bigihêje wan re awayêni pirr ecêb din. Lî, deştêni xwesikêni dewlemend heta Bakurê Malatyê (915 m.), Roj-

hilata Basûrê Elazigê (1.020 m.) û Bakurê Müşê (1.500 m.) dirêj dibin. Li dirêjayıya vê birîna anatolî, gelek hejanêni erdê (zelzele) navçeyê dihejînin û pirr zerer tînin. Em hejanêni Erzincanê, di 1939 de, ku 25.000 mirî çêkirin, ûn ji wan si-viktir, ên Varto di 1966, û Bingolê û Gencê di 1971 de, bînîn bîra we.

Li başûrê xwarbûna Torosê, navçeyêni firehîn pan ên Adiyaman, Urfa (550 m.), Diyarbekrê (650 m.), ji nişka ve, bi xwarbûna 3.000 m., ber bi Mêzopotamyê peya dibin, lê çend cihêni bilind jî dihêlin, weka serê burkanî yê çiyayê Karaca (1.915 m.) û zincîra Tûr Abdîn ku ji Mêrdînê (1.130 m) dirêj dibe û li Rojhilatê xwe bi çiyayêni pirr bilintir ên Herakol (2.943 m.) û Cûdî (2.089 m.) digre.

Li Rojhilata dûrtirîn û bêtir li Bakurê, nuqta paldana çiyayê Agirî (Ararat) û mezin (5.165 m.) û a Agiriyê piçûk (3.925 m.) weka mihwera sistemeke çiyayîyeke nuh tê dîtin. Bi rastî, ji vê navendê, gelek nuqte derdikevin û, li Bakurê bi zincîra Tendureka pirr mezin (3.313 m.) û a Ala Dag (3.255 m.), li Rojhilatê, bi çiyayêni Kuh (2.850 m.), Mengene (3.610 m.) û Ispiriz (3.537 m.), û li Başûrê, bi çiyayê Vaviran (3.550m) û zincîra Şatak, dora gola Wanê digrin. Ji xeynî her du Agiriyêni ku sedema damezrana wan kelanêni burkanîye pirr kevn e, du burkanêni naskîrî li ser gola Wanê hene: li Bakurê, Sîpan (nêzîki 4.434 m.) û xasma çiyayê Nemrûd ku kîlekâ wî ya bilintirîn digihêje 3.140 m. û ku firehbûna serê wî yê burkanî digihêje 6.400 m., û di hundurê wî de goleke bi ava xwes û ku bilindbûna wê digihêje 2.552 m. Hemî ev navçeyâ Başûrê gola Wanê ku bilindbûna wê bi xwe digihêje 1.720 m., bi tevayiya xwe perça rûniştina Kurdenî Tirkîyê a bilintirîn e.

★ Encyclopédie de l'Islam (çapa nû), 1981, Tom V, rûpel 443-446, Paris, Editions G.-P. Maisonneuve & Larose.


Wergerandin: fransîzî-kurdî: Pervîn.

Ji alîkî din jî, zincirên çiyayê din jî xwe girêdidin Agirî; ew berê xwe, rast bi rast, didin Bakur-Başûrê, nav bera golên Wanê û Urmiyê, û bi vî awayî, Kurdistana Tirkîyê ji Kurdistana Iranê vediqetînin. Piştî ku ew xwe digihênin girêka pirr dijwar, ku meriv nikare hilkişe wê, ya navçeya Harkî-Oramar, ew ber bi Rojavaya Başûrê xwe xwar dîkin û bi vî awayî zincîra mezin a Zagrosê ava dîkin. Ev zincîr, bi tevayîyeke xêzine "paralîl", perçeyên Kurdistanê, bi pareke mezin, ava dike: aliyêne wê yêne Rojhilatê li Iranê û yêne Rojava-yê li Iraqê. Weka ku C.J. Edmonds nîşan dide, her gav ne hêsan e ku meriv navekfî ji herkes re naskirî bide zincirên cihê, ji bo ku navêne wan li gora cihênu ku nûgeman tê de ne diguherin: ev yan ew kîleka çiyê, nêzîkî serîkî çiyê, gelî yan gundekî naskirîtir û yan goreke (mezel) şêxekî binav û deng.

Li Iranê, zincirên ku dû hev de derin û ku berê xwe didin Rojavaya Bakur-Rojhilata Başûrê hene. Gelek şaxen wan yêne bi rêzên paralîl jî heenne. Em, di riya xwe de, çend serêne wan ên bilintirîn nîşan bidin: Dalen-par (3.748 m.), li nîvê sêkuçka sê sînoran: ên tirkî, iraqî û iranî, Spîraz, Kandîl yan Kogiz (3.782 m.), Galala (3.364 m.); ber bi Rojhilatê bêtir, Çehel Çeşme (çil kanî) (3.416 m.) ku keleke avê ya Kurdistana Ira-

nê ya rast e; ber bi Başûrê bêtir, zincîra Hawraman (3.216 m.) û a Cilo ku bilindbûna wê ya navîn 3.500 m. ye, heta çiyayê Lûristanê û Puştî Kuh.

Li aliyê Iraqê, li Başûrê sînora tirkî, bi dewama zincirên çiyayê Cûdî, Seman û Cilo, lê di eynî zemânî de jî bi nizimbûneke nerm, ber bi destan Mêzopotamya, nav bera Dicle û Zabê Mezin, zincirên Bêxafr, Matina û Gara, û nêzîkî sînora Iranê, piştî Zabê, çiyayê Serî Korawa (3.603 m.), Dolares (3.449 m.) û Xuwarabtê (3168 m.) hene. Di vê navçeya Bradostê de, eger zincirên sînorî bilind bin jî, weka çiyayê Halgurd (4.013 m.), ew gava ku ji destan nêzîk dibin nîzm dibin. Bi vî awayî, bilindbûna çiyayê Handrîn li Rojhilata Başûrê Rawendûzê bi tenê 2.793 m. ye. Gava ku meriv tavil Zabê Piçûk dibihure, Zincîr, bi paralîl, ji hestiyê piştî Zagrosê dirêj dibin. Di xêza Kura-kacaw-Gocar-Kurkur-Asis de gelek serîf, di nav bera 2.950 û 1.960 m. de, hene. Xêzeke din, Azmir-Karasird, ji ya din nizmtir e: di nav bera 1.870 û 1.608 m. Lê, li Rojavaya Bakurê Sileymaniye, serê bilind ê Pîra Magrun (3.183 m.) xuya dibe. Zincîreke dawîn û paralîl, Bingird-Beranan, cardin çend sed metre nîzm dibe (nav bera 1.739 û 1.477 m.). Ber bi Rojhilatê bêtir, zincîra dirêj a Kara Dag (Çiyayê Reş) (1.378-2.017 m.),



Wêne: Pierre RONDOT, Destin du Proche-Orient, r.271, 1959

ê bi geliyên cihê, ji vira û şûn de welatê bilind ê deştan **vediqetîne**. Ev deşt, bê manf, ber bi Altun Köprü, Kerkük û Tawk dirêj dîbin, û ber bi Rojhilate bêtir, çiyayê Hamrîn (1.640 m.) dora van deştan dîgrin û wan radiwestînin. Ev çiya berê xwe didin Rojhilata Başûr-Rojavaya Bakurê û çemên Diyala, Sirwan û, li dawiyê, Feratê, nêzîkî gihaştina Zabê Piçûk, dibuhurin.

Li ser de jî, pêwist e em çiyayê Sincar ku yezfîdiyênu ku Kurdêñ rast in tê de rûdinêñ nîşan bidin, herçend e perçekirina idariya nuh a Iraqê wî li derveyf Kurdistanê dihêle. Ev zincîra ku dirêjbûna wê 60 km, firehbûna wê 15 km, û bilindbûna wê nêzîkî 1.600 m. ye, li Mêzopotamyê, li Rojavaya Müsilê û di eynî dereca firehbûna wê de cih stendiye.

Çem


Eger Kurdistan welatekî pirr çiyayî be jî, ew bi awakî zengîn ji aliyê gelek kaniyêñ zelal, riyêñ avê û çemên rast tê av dan.

Em di destpêkê de Aras nîşan bidin. Ew kaniya xwe ji hundurê Kurdistanê, ji mersefa Bingolê, Hezar Gol, ji navbera Dicle û Feratê, distîne. Lê, di eksê van her du çemên ku ber bi Rojavaya Başûrê diçin, ew, di destpêkê de, ber bi Bakurê diçê, paşê ber bi Rojhilate xwar dibe û derbas dibe Ermenistana Sovyêti.

Her du çemên mezinêñ ku menzera wan pirr xweş e, ewê, bi hêzanî, ji Kurdistanê derbas bibin: Ferat ji du milêñ bingehî ku dora navçeyeyeke fi-reheke kurdfî dîgrin ava bûye; şaxa jorîn, Kara Su (450 km), di destpêkê de, ji gelek kaniyêñ ku ji çiyayê Dumlu hatine ava bûye; paşê, ew di deşta Erzurûmê de diçê. Li wira, ew kaniyêñ ku li çiyayê Çoruh **dipijiqin** distîne, ruyê xwe dide Rojavayê, di geliyêñ teng de, Erzincanê av dide, ber bi Başûrê xwar dibe û, bi awakîne muntezem, weka maran, diçê her alî, Kemahê av dide, derbas dibe Kimaliyê, li her der, li çiyayêñ ku riya wî dîgrin dikeve, ji bo ku hînek li Başûrê Ergilê bigihêje şaxa xwe ya jêrîn, ango Murad Su (650 km) ku kaniya xwe ji Bakurê gola Wanê, li piyê çiyayêñ burkanî yêñ Ala Dag û Tendurek distîne; Murad Su hînek hildikişe Bakurê, derbas dibe Diyadin û Karakose, ji nuh de diçê Başûrê û Tutak û Malazgirt av dide, û paşê, her gav weka maran, derbas di-

be Bakurê Müşê, av dide Genc, Palo û Pertek, ji bo ku, di dâwiyyê de, li Başûrê Kebanê, bigihêje şaxa jorîn. Ji nuha û pê de, her du mil Feratê bi xwe ava dîkin. Şaxa sereke (bi tenê) a giring a keviya rastê ya Kara Su Tohma Su ye (194 km) û ew digihêje Bakurê Malatyê û paşê diçê derveyê Kurdistanê. Lê, Murad Su gelek şaxêñ wî hene ku, weka Perî Su (235 km), bi şaxêñ xwe yêñ piçûk, dora Kurdistanê bi carek dîgrin; tu gund tu car ji riyekê avê pirr dûr namîne.

Dicle, şema mezina din a navçeyê (1.718 km), di riya xwe ya jorîn de Kurdistanê av dide. Ew kaniya xwe ji navçeyaya gola Hezarê, li Bakurê çiyayêñ Maden, distîne û di dirêjaiyya 300 km de, li Kurdistanê Tirkîyê, bajarêñ ku di dîroka kurdfî de binav û deng in: Erganî, Diyarbekir, Hasankeyf û Cizre, av dide. Gelek şaxêñ wî, hemî li çepê wî: Anbar, Batman, Gurza û, bi hêzanî, Botan (226 km) welêt dewlemend dîkin. Ew sînora Iraqê, li pêş-Xabûrê, derbas dibe û li wira digihêje şaxa xwe, Xabûr, ku şaxa wî ya piçûk, Hazil, Zaxo baş av dide. Li wira, şebekeke çemên xweşik ava dibe. Hemî şaxêñ Dicle ne, lê çemên rast in. Di destpêkê de, Zabê Mezin (392 km) ku kaniya xwe ji Tirkîyê, çiyayê Mergene, di nav golêñ Wan û Rezayê, distîne. Ew Culamarg, paşê, li Iraqê, navçeyêñ Zibar û Barzan av dide. Yek ji şaxêñ wî ji bajarê Rawendûz ê pirr xweşik av dide. Ew, pişti 45 km ji Başûrê Mawşîlê digihêje Dicle. Zabê Piçûk (400 km) kaniya wî li Iranê ye, nêzîkî Lahicanê, welatê golan. Şaxêñ wî pirr in, li Iranê û li Iraqê. Pişti ku ew Taktak û Altun Kopru av dide, digihêje Dicle. Di riya wî ya jêrîn de, li Dukanê, barajeke pirr mezin ku hêza wê 7 milyon m³ û aqara wê 50 km² ye, di sala 1958 de qediya. Amanca avakirina wê, di destpêkê de ava Dicle ku carina bilindbûna wê pirr bi tehlike ye muntazam-kirin bû. Lê, li ser de jî, avdana nêzîkî 350.000 hêktar erd bû. Fabriqeke hidro-elektrîkeke giring bi hêza 200.000 kw, li navçeyaya Çamçamalê, heye û tê gotin ku ew ji navçeyêñ kurdfî yêñ Iraqê re otonomiya wan a ênêrjiyê dide. Adhaym (230 km) ku ji nêzîkî Bazyanê tê, bi şaxêñ xwe yêñ cihê Kerkük, Dakuk Tuz û Xurmatu av dide û berê ku xwe bavêje Dicle, 30 km li Başûrê Baxdayê, ji çiyayêñ Hamrînê derbas dibe. Di dawiyê de, Diyala (386 km) ku kaniya xwe ji çiyayêñ sînora Irak û Iranê distîne



Wêne: Wan. Elisée RECLUS, Géographie Universelle, r.373, 1884

heye; li Iraqê, kaniya wî ya bingehî Tancaru, ku deşta Şehrezorê av dide, ye, û li Iranê, kaniya Sîrwan ku li Lûristanê çêbûye ye. Li Iraqê, piştî Derbendî Xan ku tê de barajeke mezin ku ji bo avdanê hatiye ava kirin, ev her du şax Diyala ava dikan. Diyala jî nêzîkî Başûrê Baxdayê xwe davêje nav Diclê.

Kurdistana Iranê jî jê gelek Çemên ku piirr ji wan kaniya xwe ji Çihil Çeşme (Çil Kanfî), çiyakî mezin (2085 m) li welatê Mukrifî, distînin, derbas dibin. Nîşandana Kezel Uzun ku şaxên wî yên cihê hemî welatê Ardelanê av didin bes e. Ji xeynî wî jî Cagatu (240 km) û Tatahu xwe davêjin nav gola Rezayê.

Weka çiyan, çemên Kurdistanê karin, li gora navçeya ku jê derbas dibin, navê xwe biguherînin. Gelek riyân avê jî navê gundê bingehî ku jê derbas dibin distînin.

Gol

Li Kurdistanê çend gol jî hene. Mezintirîna wan gola Wanê ye. Bilindbûna wê 1.700 m. Û aqara wê 3.700 m² ye. Ava wê şor e, ji sedema barajeke burkanî ku li keviyên wê karbonat û sulfatê soda datfine. Tê de celebekî tenê yê masiyan, "inci baligi" ê mezin û ku rengê wan diguhere, tê girtin. Li Bakurê gola Wanê, gola Nazik û li Rojhilata Bakurê Wanê, gola Er-

cek, hene. Li Bakurê bêtir, gola Bakurî, li Rojhilata Karakose heye. Li kaniyên Diclê, li Rojavaya Bakurê Maden, gola Hazara kûr û a ku aqara wê nêzîkî 50 km² ye heye. Ava wê şor e û jê masî "yilan baligi" tê girtin. Li Iranê, em karin gola Urmiyê ku gelheyên kurd li dora wê dijîn nişan bidin. Ev ji gola Wanê firehtir e (5.700 km²), dirêjbûna wê 130 km û di hin cihan de firehbûna wê 40 km ye; ew ji Deryayê Mirî şortir e; tu masî nikare tê de bijî. Ji wira ne dûr û li Başûrê, du golên piçûk, Golla Sor û Deryaçefî Kopî, hene. Li sînora Iraqê, li Rojavaya Marivan û li Rojhilata Başûrê Pencîwînê, gola Zrêbar heye. Li Kurdistanâ Iraqlê tu gol tu nene.

İklîm

Ji sedema bilindbûna Kurdistanê, iklîma wê dijwar e. Berf serîn çiyayên bilind, bi mehan, digre. Helanbûna wê li gora navçeyan diguhere. Di deştan de, ketina baranan di nav bera 200 û 400 mm. ye, lê, li mersefan yan di nav bera zincirîn çiyayên cihê de, ev kûrbûn digihêje 700-2000 mm û heta 3000 mm. Di geliyen Kurdistanâ navîn de, iklîm kit'eyî (continental) e û heta bêav e. Carina, çend meh bê dilopeke av derbas dibin.

Weka iklîmî, dereca germbûnê jî piirr diguhere. Ew, li Karakose, li Bakurê, di zivistanê de, kare bikeve

-30/35° û li Başûrê, li Kermansahê, kare hilkişê +35/45°. Li Kurdistana İranê ku iklîma wê kit'eyîf û hisk e, ferqa dereca germbûn û sarbûnê pirr mezin e: -22° û +32°. Bi awakî giştî, dereca germbûna kîlekên Zagrosê yêñ Rojhilate ji kîlekên Rojavayê çêtir e: li Senna, di meha cilê de -15° û di meha temmûzê de +41,8° ye; li Kerkükê +14,5° û +43° ye. Li Rojava-yê bêtir, di çile û temmûzê de, li Malatyâ: -1,5° û +26,5°; li Urfê: +4,5° û +32°; li Diyarbekrê: +2,5° û +31°; li Wanê: -3,5° û +22,5°.

2. TABİETA KU DİJİ

Şînayî

Iklîma Kurdistanê çiqas hisk be jî, ew ne çol e û çiyayêñ wê bi zozan û şînayî, geliyêñ wê bi daristan û mîrgân ku hemî, di beharê de, bi gulân rengareng xemilfine hatine girtin. Bi vî awayî, li Kurdistana Tirkîyê 10 milyon hêktar daristan, li Kurdistana İranê 4 milyon û li Kurdistana Iraqê 1.720.000 milyon hene. Ji wan jî 50 km² ên darêñ çam in. Dara berû ku jê 15 celeb hatine ji-martin giringtirîna daran e. Ew, hefta di bilindiya 2.700 m. pirr tê dîtin. Piştî wê, çam û darêñ dinêñ lihev badayî têñ. Ji xwe, daristan ne hergav asê û tarî ne. Pirr caran, ew weka erdêñ tenha ku tê de darêñ guhfîj hene ne. Darêñ bî û bi hêzanî û spîndar li keviyêñ avan pirr in.

Li çiya, zozanêñ havîniyêñ bilind bi kîlometran dirêj dibin û tê de kerîyêñ bîzin û mîşin diçêrin. Li her der, giyayêñ hov ên ku têñ xwarin û ku şivanêñ piçûk li wan digerin û giyayêñ besit û tabîf ku jî-nêñ pîr bi gelek hurmet diçinin hene. Çiqas gul hene ku, di beharê de, her perçeve erd bi awakî dewlemend digrin û ku zengîniya wan meriv pirr şas dike û bîna wan wî serxwes dike. Ev şînayî hemî ji me re naskîf ye, ji bo ku celebêñ wê li Ewrupa hene, û merivêñ ku li Kurdistanê geriyane navêñ wan gotine (nîse: C.J. Rich, cild I, rûpel 284; Bisshop, c. I, r. 290-1, 343, c.II, r. 12, 14, 115; Lynch, c. I, r. 181, 190-1, c. II, r. 208, 248, 253, 256, 265, 268, 269, 303, 362, 369, 239, 241, 242, 382; Fr. Stark, r. 257, 273, 330; Hamilton, r. 141-3; Balsan,).

Ziraet

Birek bitenê ji erdêñ kurdi ku têñ

ajotin bi maddêñ çandinê û zad têñ nixumandin (girtin). Eger li Tirkîyê 25 milyon hêktar erdêñ ziraf hebin, bitenê 30% ji wan têñ çandin û ji van 30% jî 1/3 her sal beyar (bê çandin) dimîne (Esenkova, r.108). Li Kurdistana İranê, ji 5 milyon hêktar erdêñ çandinê, 24% hatine çandin û 16% bê çandin mane (Qasimlo, r. 90). Li qezayêñ Kurdistana, Iraqê yêñ cihê û ku aqara wan a çandinê nêzîkî 8 milyon hêktar e, 1/4 tê çandin (Xosbak, r.43). Li gel vê qasê, çandina toy li Kurdistanê, bi pareke baş, dikeye abora van welatan: 15% li Tirkîyê, 35% li İranê, li Iraqê 50% ji genim û 15% ji ceh (Qasimlo, r.89, N°6). Li ser de jî, çandina birinc ji Iraqê re 1/3e produksyona (ürün) wê dide. Li ba van maddêñ ziraf yêñ xwarinê, pembû û pincar ku nuh ketine ziraetê karekî baş tînin. Tutunê çêtirîn ê Tirkîyê û Iraqê li Kurdistanê tê çandin. Ü Kurdistanê Iraqê nêzîkî tevâyiya vî tutunî dide Iraqê (Xosbak, r.45; Durra, 1963, r.226; 1966, r.245). Eger tîrîf li gelek deran, li Tirkîyê, Iraqê û Iranê şîn dibe, ew bitenê li Kurdistanê, li ser giran pirr şîn dibe; li Iraqê, 12 milyon şitil hene (Vernier, r.468), û celebêñ tîrîf pirr û cihê ne (navêñ wan di Hawarê, N° 34, r.8; Wahby, Rêziman, r.148 de hene). Hin ji wan ji bo amadekirina mewfîjêñ ku di xwarinê de pirr têñ bi kar anîn têñ his-tin. Darêñ meywan (fêkiyan) jî li Kurdistanê pirr in: hinar, şeftali, sêv, hijr, zerdalî, gwîzêñ sedansalî. Çandina şînayiyê pêş de diçe, li dora gundan û heta li çiyêñ ku li ser wan Kurd, bexçevanê bijîr, benêñ ku bi dîwarêñ piçûk hatine girtin ava dike, ji bo ku tu perçeve erdê çandinê hunda nebe. Ji xeynî şînayiyêñ ku li Ewrupa pirr hene, bi hêzanî pîvazê ku hemî Kurd jê gelek hez dîkin û çend şînayiyêñ weka zebeş, xiayar, gundor, balicanê reş, bamya, fsot û xesê ku yezidî jê nefret dîkin têñ çandin.

Lawir

Li Kurdistanê, lawirêñ hov hunda ne bûne. Di sedsala 19a de, hîn jî şer hebûn; eger ew fro ne mabin jî, pîling hîn hene. Hirçêñ ku li Nebir-nao, li Başûrê Wanê, ji wan re "ma-seke tije xwarin, ji hezfranê heta filonê" (Balsan, r.229) heye pirr in; xinzirêñ hov, li Bingolê pirr in (di 1939 de, di sê mehan de, 1200 hatin kustin) (Balsan, r.90-1) û 55 di careke tenê de, di 1963 de, li

Barzan hatin şerjêkirin. Gur, torîk, rovî û keftar gelek caran ji gundan nêzîk dîbin. Lawirêñ din jî hene ku ji wan re hov dibêjin, lê ku göst naxun. Ew, yan ji bo göstê wan, weka pezkoviyan û yan jî ji bo şabûnê (kêfê), weka kiroşkên hov û kiroşk, têñ nêçir kirin. Jûjiyêñ ku têñ xwarin, weka ku filleyêñ navçeyê ji wan re ewha dibêjin, sihorêñ sivik û lawirêñ dinêñ piçûk ku kurkê wan pîrr xwesik e (bi fransizî: martres, zibelines; bi tirkî: zerdeva, samur) û ku ji bo kurkêñ wan têñ kuştin hene. Ji bo vê yekê, pêwist e em şas nebin ku Kurd ji roja çêbûna xwe nêçîrvan e. Teyr jî pîrr in. Çiyayêñ bilind teyrê bazê biheybet dihewînin. Çem û kanî ordek û (sarcelles: bagirtlak û bécassines: su çullugu) dikişînin. Di 1972 de, 500.000 ordek li ser gola Rizayê zivistanê derbas kirin û zikê xwe bi celebêñ kurmêñ biqalik (crustacés: kabuklu-lar) ku tê de dikelin têr kirin, û di eyîf demî de, gola Wanê gelek binêñ (pélicans: kaşikçikuşu) dihewand (J. Vieillard, le Monde, 13.J.73). Bilbil, leylek û quling di tabietê û di stranêñ kurdi de jî hene. Ti-vîlk û kevok, bi hezaran, şkeftêñ ku nayêñ jimartin û çiyan. bê rawestan, fîgâl dîkin. Kew û susk çivikêñ nêçîrê yêñ çêtirîn in. Masîf di çemêñ ava hênik û zelal de pîrr in. Lî, ne hergav hêsan e ku meriv wan nas bike û ji wan re nav bide. Di Zabê de, masîfî geleve ku fille jê re dibêjin "masiyê Tobî" û ku dirêjbû-na wî du metre ye û tama wî pîrr xwes e heye. Wêneke wî di Hamilton, r.32-33 de heye. Li ba van lawirêñ zerîf, pêwist e meriv bala xwe bide marêñ piçûk, lê bi jar, dûpişkêñ zer yan reş ku vedana wan kare meriv, bi hézanî zarokêñ pîrr piçûk, bikuje. Lî marmarok, gumgumok û kîso bê ze-rer in. Lî, di beharê de, meriv ji mîşan, kelmîşan û kîçan ku belakî rast in ditirse. Mîşa hunguv jî ve-dide, lî hunguveke hov û pîrr xwes dide.

Li ba van lawirêñ ku bi serbestî di-jîn, li Kurdistanê gelek lawirêñ ku meriv ji bo menfeeta xwe xwedî dike hene. Ev xwedîkirin ji demêñ pîrr kevn dewam dike (Ch. A. Reed, Animal domestication in the Prehistoric Near East, Braidwood. Prehistoric investigations in Iraqi Kurdistan, Chicago 1961, 119-45). Bi rastî, Kurdistan welatekfî xwedîkirinê ye: pez, bizin, çêlek û gamêş, ji xeyîf şîr, rûn, penfrû göst, şerm, kurk, hûr, qiloç dîdin. Şerm û hiri-

yêñ wan ji bo çêkirina cil, sol, kuvlav bi kêr têñ û karekfî abori-yekî rast tînin. Di 1957 de, li navçeyêñ kurdi yêñ Tirkîyê, 17.662.332 pez û 4.176.016 bîzin, ango 1/4 ji tevayiya xwedîkirina lawiran li Tirkîyê; û 2.240.825 çêlek, ango 1/6, hebûn. Gelek gamêş jî hene (Balsan, r.128). Li wilayetêñ kurdi yêñ Iraqê, 1.674.912 pez, ango 2/3 ji xwedîkirina lawiran li Iraqê, 2.234.238 bîzin (2/3), 226.858 çêlek (1/3) û 4.287 gamêş (1/10) hene. Ji xeyîf xwedîkirina mezin a lawiran ji ali-yê koçeran (li Iranê, ew nîvî "produksyonê: ürûn" ava dike; Stauffer, r.291), her malî kerîkî wê yê piçûk ê çend mî yan bîzin (4 heta 8) heye (Stauffer, 290). Gundêñ kurdi yêñ Iraqê ku Barth (r. 19) li ser wan lêgerînekê çêkiriye, hîn dewlementir in. Her malî çend mirîkêñ wê jî hene. Celebêñ cihê yêñ pezêñ bi dûve-ke qelew û yêñ bîzinêñ bi müyêñ di-rêj hene. Ew malen (hebûnê) çaveki-rî yêñ şivanêñ ku seneta xwe baş za-nin in. Di jîna rojî (her roj) de, lawirêñ dinêñ pîrr pêwist jî têñ xwedî kirin. Li ba Kurdêñ Iraqê, meriv 22.289 hesp (1/7), 52.336 bergîf (nêzîkî tevayiya yêñ Iraqê), 130.804 ker (1/3; Xosbak, r.52) dibîne. Em seyîn (küçik) şivanêñ kurd ku cinsê wan xurt e û ku meriv ji wan ditir-se (Balsan, r.236) ji bîr nekin. Bi taybetî, li Kurdistanê ne xinzîr û ne kiroşk têñ xwedî kirin (Arnab, suppl.).

Binerd

Binerdê Kurdistanê, bi dewlemendiya xwe, ji sererdê, bi şfnayî û lawirêñ xwe, ne kêmtir e. Lî, heta nu-ha, dewlemendiyêñ wî bi dereceke ne kaffî hatin bi kar anîn. Komir li navçeya Maden, Kigi, Kemah û Xarpû-tê, ku ew li wira tê derxistin (di 1970 de, çend hezar ton) pîrr e; li Zaxo, li Kurdistanâ Iraqê, ew nayê derxistin. Li nêzîkî Sileymaniye, kevirê kilsê tê traştin (şkenandin) û derxistin, û li Sar Çinar fabri-qeke çîmento, ji sala 1958, 350 ton çîmento di rojê de çêdike. Li Sin-car, Şayxan û Tuz-Xurmatu, depoyêñ xweyê xam têñ bi kar anîn. Li navçeya Senna, li Amadia, kibrît tê diftin û Polonî dixwazin jê, di salê de 250.000 ton, li Mişrak, li Bakurê Kurdistanâ Iraqê, derxînin. Hesin li Kurdistanê ne kêm e û ew tê derxistin (1.600.000 ton di 1960 de, li Maden). Lî, depoyêñ xamêñ hesin ên pîrr dewlemend, bi hézanî li navçeya Rawendûz û Sileymaniye, têñ bi kar

STRANEK GELERİ: XERABO

- II -

Min di bazê dila barê xwe bar dike, berê xwe dide aşê mala Hacî
Sendîn e.

Tu li wê newalê timam bigere, tu li heft seriya bigere, tu çavkî
di wan de nabîne.

Min dî mîrata çapê li arvanê bazê dilê min dixfîne.

Heft çap û nîva ji arvanê bazê dilê mi hiltfîne.

Daweta min û Xerabê bi tenê sala vê salê nêv cî li dar dimfîne.

Xerabê mi xeyidî ji gundiya, ji maliya.

Mi dî da ser rîka Omeriya,

Minê digo: "Ezê rabim, ban kim heval û hogir û hemşeriya,

Bila herin, xelkê delal vegerfnin bi kef û eşq û laqirdiya,

Bila Xwedê teala bîqedfîne miradê miradxwaza û dîlketiya,

Bila miradê min û Xerabê mi bîmfîne heyâ koçerê me vegerin ji dêsta
Mûşê, rûnin akinciya.

Xerabo, dîno, Xerabê xelkê,

Te bêjin ziravo, bi terha benikê,

Dîlkê min û bejna zirav di hev hebû çi kula go ketiye mala xelkê.

Xerabo, dîno, mala bavê keleşgewra mi li wê civê, li wê ewcê, li wê
zikakê, li wê fitlekê,

Te meşqazê, meşqetikê, meşordekê,

Heçiyê xortê go bi çavê xwe dî û bi dilê xwe zewicî, ewê sê roj û
sê şevê xwe kuştine ji dinyaê, ji qocê felekê.

Xerabo, dîno, bila li te be, li wî dîlf,

Bila li mala hezar û heft sed bavê te be, li wê sewdanê, li wî aqilî.

Çewa te dev ji mi, kihêla serê tewla berda, tuê li bergfla şixulê
Rismiliya û Qibaliya dihesilî.

Mi ji te re ne go: "Di meha biharê, bergfla li şwîna kihêla metewilî!"

Li xûşka mezin binêr, dû re xûşka biçûk ji xwe re werî.

Lawiko, dîno, ezê çi bikim? Sala vê salê, ez bi mîr im, tu bi jin î.
Kul û kederê te gelek in, şak berdane ser vî dîlf.

Kul û kederâ ji bîra nakim, heyâ axê mezelan, kîlê di kevirî.
Kul û kederê te pir bûne, tucar dernakevin ji vî dîlf.

Xelkê digo: "Keleşgewra te esmer e û genimgwîn e."

Bi xelkê tehl e û bi nevsâ ni şérîn e.

Tu rabe, serê xwe di kulek û şibakê qesrê re biderzîne!

Bila sîra baê Qerejdaxê li ser şebiskê te ê şê xfîne!

Bi ser henarkê rûkê rastê te vegerîne.

Ez dikim herim welatê xerîb û xurbetê, tu kanf ramîsanekê bi mi de,
ji boxaza qırıkê, ji xanûmanê gerdenê,

Bila kederê ramîsanê te keçikê li welatê xerîb û xurbetê di dilê mi
de nemîne.

Wexta Ezrafl dakeve, rûhê mi distfîne,

Wê gavê, bila diwanzde mikweta zêdfî heqê mi li mi xfîne,

Bila heqê ramîsanê keleşgewra mi ji mi hilîne.

Xerabo, Xerabo, Xerabo! Wey li minê, wey li minê,

Çewa fro hatiye cewaba nexêr e ji mi keçike re.

Digo: "Delalê dilê te li welatê xerîb û xurbetê nexwes e, nexwesekî
li ber mirinê."

Ezê ji komê pismama ne wêrim herim serîkfî bidimê.

Xwezi ji xêra Xwedê re, ezê bîstekkekê li tenîsta Xerabê xwe rûniştama,
meyê li hevûdu helal bikira heqê ramîsana, malfeta
derdê dîlketinê!

Geli gundi û malîno, car û cirano, hûnê bi qedrê Xwedê kin, mala Xerabê
mi ziyareteke pir evzel e, hûnê bi destê min bigirin
û mi bibîne.

Çi darika di bexçê mala bavê mi de bû, ji gula, ji beybûna xemilandî,
Xerabê mi rahiştî hejkî, lêxisti, timam diweşandî.
Bê lome be, çewa dostikek mero gelik i bedew hebe,
Li çiyakî mina çiyayê Omeriya be,
Mero dev jê berde, dil pêkeve erebekê, li binê beriya jêri, û lêvdegandî!

Xerabo, wile, tu Xerabo,
Malê te pir e, ji canê te re edabo!
Tu bi şexkî diwanzde elmî bo,
Sed werdê te di bêrkîka mi de bo
Qenyantiya dilê mi bi te nabo!

(Kovara HAWAR № 38, 1942, rûpel 12-14.
Straneke gelerî ku ji aliyê "TAWÜSPAREZ",
li ba eşîra Omeriyan, li Mêrdînê, hatiye
bijartin)

DEPREMA ERZURÛMÊ

Bira

Rojek çêle, qesa û berf diket
Sar û seqem, bayê cemidî dihat
Bû şev, ro çû ava û res derket

Gundî wê rojê ji ji kar hat û ji hal ket
Têrkirina zarokan û qedandin bi sibet
Lê dfsa nebû zadê zewade û namet

Wextê li ber şivê runişt tev malbet
Di wê kîlîyê de xanî hêrivt û erd şikest
Ava sewîla û xwîna insana li hindur lev ket

Ji binê wî xanî yek bi zor derket
Li gund nêrf û jê ma heyret
Û dît bê çend insan bûne ceset

Bo wan şêx melan dikirin kelamet
Bê avdest û bê tehret divan bikin îbadet
Û şîret didan tev tobe bikin cemaet

Ji mij û duxanê, wek rojek dawet
Û digotin ev millet û cihê cehalet
Li gora dînyayê encev ev bibe rîwayet

Edî ji ber depreman nema taqet
Pir' ji me mirin û gelek ma ne seqet
Wekî din ji her bi feqfrî û sefalet

Encev weha ne li dînyê felaket
Qernê 20 de weha rezalev
Ger li sebebdaran bibarin nalet

TÊGIHEŞTÎNA ÇIROKÊN GEL

- III

Tarî

DÎ ÇIROKAN DE DAXWÎYANA AXA Û AXATÎYÊ

Dema ko me gohdarî li çirokêن xwe kir an xwend, emê bibfnin ko gelê me di çirokêن xwe de gelek qala axayê xwe, mîrê xwe û begê xwe kirîye. Ti xweruyik "özellik" nehiştîye di derhekî van kesan de. Pêwanê em wan kesan êdî xwes nas dîkin. Bi vê cih danê de nasandina wana ji xwe re kîriyê armanc. Ji alfkî din bi vê yekê rista xwe yf civakî didî nasandin. Ev rist weke xelekekê xwe berdaya ser milê gelê me, hisk girêdaye, qet nahêlf ko bitevgerî. Gelê me vê ristê, xweruyîya kesen ko ev rist di destê wan de xwes nasandin e. Divê ko em jî, dîsa bi devê çirokan wan kesan nas bikin. Weke hozanê şoresger fî hêja Ehmed Arif gotî: "Ev namus e, li kunya me hatîye kolandin. Ev jî sabir, ji jehran hatîye parêzandin. Evan mar û maşot in. Evan jên ko çav berdana nan û girara me. Wana nasbike, nasbike û mazin bibe".

Daxwîyana axatîyê : Axatî pêmayîneke

Nîse:

Dibê fermanik ji sultanê Osmanî di derheqî Ehmed axayê millî derdikevî. Divê ko Ehmed axa herf heft sala serbaziyê "askerf" ji Tirkâ ra bikf. Ehmed axa li ber çûyîna serbaziyê dizivirî eşîra milla.

- Heye ko ez bême kuştin an bi emrê xwedê ez bimirim û nezîvirim. Va kurê min Bersel axa li cihê min. Ew qenc, ew xerab bî, divê win wî deyîn ser cihê min û axatîyê li we bikf. "Ji çiroka Ehmed axayê millî".

Weke ko di çirokê de hatî berxistin, axatî pêmayînek e. Ew çiqas bikêr-hatî jî bî, li kirina axatîyê ji heft bavê axa çêtir jî bî, gelê me vî cihî nadî kesekf din. Nemasa cihê xwe li wêdê nabînfî. Vî karî ji karê xwe cida diarî.

Nîse:

- Lawo, dibêjî Bersel axa pîrê. Hege tu ji malaka baş bana, tu kurê Ehmed axayê millî bana, rayik ji mala paşayê millî bi te ra hebana, te destê xwe li me hilnedida. Lê ew dêlika diya te, te ji ber kîjan dar û devîya girtî, tu dirabî vana li me dikf. "Ji çiroka Ehmed axayê millî".

Axatî pevgirêdanîya malbata ye

Nîse

Dibê wê salê qehtîke giran hat ser koçerên zozana jorfn. Heywanê wana qeliyan, insanê wana ji birçîya teliffîn. Dema berê ko insan dikete tangayîyê, çavê wana li yekî digerî de arîkarîyê bidî wana. Ehmed begê, begê koçerê zozana jorfn, xwe li Xalit begê, mîrê deşta Rihayê digrî. Bi hev re heywanê xwe diçérfinin, parîyê nanê xwe li hev leva dîkin û derdikevin baharê. Di vê navîyê de Ehmed begê keşa xwe Gurca Muşê didî Xalit begê. Li vegera zozana jorfn wê dawata bihate kirin.

Li vegevî éla Ehmed begê liqayî deşteke bixêr û bêr dibî. Konê xwe di-berdin erdê. Nêta wan li vê deştê mayin e. Deşt ya Usif begê, maqûlê Homanê ye. Usif begê nahêlfî de êl li koza wî deynî. Bi merca dayina Gurcê enceq wê êl li deştê bimana. Ehmed begê divê ko keşa xwe yf bidergisti bidî Usif begê. Pêşî Gurcê, piştra kurê Ehmed begê fî biçuk li ber biryara bavê xwe dirabin.

- Berxa minê, dibêjî Gurcê diya wê. Çavê te birijihî, situwê te bişikf. Bavê te Ehmed begê, milukê zozana jorfn, ma zaroke tu van gotin û galgalê bêdedebî li ber dibêjî. Ma tu ji bavê xwe binamustirf. Da rabe situwê xwe bişikêne, cilê xwe yî bûkanî li xwe bike, xwe bixemiline. Xwe berde, rahêje misinê qehwê, here li ber Usif begê, li cihê edebê bira-weste.

Gurcê ser vê gotina diya xwe, situwê xwe xwehr dikî û bi ya dê û bavê xwe dikî. Lê kurê biçük Heso le ber xwe didî.

- Yabo, dibêjî Heso. Tu xuha min rojekê didî yekf, ji yekf disitênf. Ez kurê te Heso me, birayê biçuk im. Bi navê xwedê ko hate derheqa namûsê, ez tiliha xwe dixim ber çavê xwe, nura xwedê ji çavê xwe dertînim. Ez ti bazarî li ser Gurcê qebul nakim. Min xuha xwe daye Xalit begê, mîrê deştâ Rihayê. Kesik ji xeynî Xalit begê ez nahêlim ruwê Gurca Muşê bibînî.

Ehmed begê guh nedaye kurê xwe Heso jî. Keça xwe daye Usif begê. Xaber digihêjî Xalit begê. Xalit begê tevlu sad suwarê xwe tê li ber biryara Ehmed begê dirabî. Ev yek li Heso xwes nayê. Tiştê ko Xalit begê li buwara bavê wî kirî bêdedebî qabul dikf. Ew jî ji biryara xwe yî dayî devegerî, li gel bavê xwe cihê xwe digrif.

- Yabo, dibêjî Heso. Ne ko Gurca Muşê bêxwedî ye. Ez birayê wê Heso me. Gavanê suwara me. Me soz û qerar, bext û dîn daye Usif begê. Yabo ez nuha xwe jê nasitênim û nadim Xalit begê. Ko Xalit begê û sad bavê wî li ser bin, win mîr bin û mîrê çê bin, winê bîn Gurca Muşê ji binê kon derxin.

Dibê ser vê gotinê Xalit begê dirabî Gurcê diravênf. Heso didî pay Xalit begê û sad suwarê wî. Wana di nîvê deştê de digerî. Dikevin şerekî giran. Heso her tim li derba kuştina Xalit begê digerî. Lê destê Xalit begê nagerî de derba kuştinê li Heso bixf. Pêwanê şerê wana dom dikf. Di vê naviyê de dilê Gurcê bi birayê wê diêşfî. Ji kuştina birayê xwe ditirsî. Dibakî xulamekfî, dişiyenf gel Usif begê, de hawarekê bişiyenf. Usif begê wê rojê di mîhvantîya xalê xwe de ye. Dema ko dibihîzfî hawarakê ji xalê xwe disitêni. Diçî bajarê Homanê. Ji wir jî hawareke giran radikf û xwe digihênfî hawara Heso. Gurcê dibînfî ko hawareke giran li ser Xalit begê de girt. Hingî Gurcê divegerî birayê xwe Heso.

- Heso, dibakî Gurcê. Birawo lo. Min nizanibû wê felek li serê min bigerî. Min digot tu û pismamê xwe Xalit begê heneka dikan. Min nizanibû wê ev bîn serê Xalit begê. Hege tu hawarê nedî Xalit begê haveyna namûsê di serê te de nîne. Te ci li serê me kir malmîfrato. Tu dibînfî du eşîrê giran xwe kışandine ser Xalit begê. Ma namus di serê te de nema. Pismamê te Xalit begê bitenê ma Heso.



Axa û gundiyek ji Kurdên Kalbor

Türken, Kurden und Iraner seit dem Altertum
Egon FREIHERR VON EICKSTEDT, Professor der Anthropologie
Stuttgart, 1961

Ser vê galgal û gotinê Gurcê, Heso lingê xwe li hemdanîyê dişidêni û xwe digihêni pismamê xwe Xalit begê. "Ji çfroka Ehmed begê û Xalit begê".

Nîşe

Dibê ïskanê Gulixan çav berda ravandîya Elîyê Mehmed Seyrê Xatun. Dê Seyrê ji xwe re bisitêni, wê şevê Eli dikujî. Seyrê ji wir diravî, diçî serê çiyayê Mehdfîya. Ji wir xeberê ji birayê xwe Qol Qasim ra dişiyêni.

- Qol Qasimo keko, dibêjî Seyrê xatun. Ez neketim ber hetîket û rureşîya dînyayê. Ez ketim ber Elî. Elîyê ko kurapê min û te bu keko. Laşê wî li kelha gomanîyê, di nav lapên dijmin û neyaran de, Qol Qasimo keko li wêdê bêxwedi maye.

Dibê Qol Qasim xwe digihêni kelha Gomanîyê. Bi awakî dibakî ïskanê Gulixan, wîna têni bin konê xwe. Wîna didî axaftin. Piştra lê dizfvirî.

- Heyla min bavê te di qebra res û tarî de rayandî, dibêjî Qol Qasim. Ji eqlê te weye ko Qol Qasim ji kuştina kurapê xwe bihurtfîye. Sabav kûrê wî sabavî? Çawa destê te çû yekî weke Elîyê Mehmed, wî tevnalê xorta. Di xewna şîrin de kuşt. "Ji çfroka Seyrê".

Axatî hevkariya tev axa ye

Nîşe

Dibê Qol Qasim kuştina kurapê xwe Elîyê Mehmed ji ïskanê Gulixan pirsî.

- Evar bû, dibêjî ïskanê Gulixan. Xortek û qizek dane devê derî. Min ji wana pirsî. Xort ji min ra got ko eva min ravandî, xuha Qol Qasim e. Min got, malava. Welatê Hesenan û Heyderan û Qol Qasim kirfîvî me ye. Em yêñ hev in. Mêrikê axa hevdû nasnekin jî, her tim yêñ hev in. Milkê me yêñ hev in. Min meyzand ko xuha te ravandîye. Min bi sîyasetî mehra wana da kirin. Min wana xiste odekê. Dema ko razihan, min xecera xwe kîsand û min wî kuşt. Min divabû ko xuha te li gel xwe bigrim û xeberê bidime te. Lê xuha te xwe li derî xist. Hêj jî nizanim bê li ku ye. "Ji çfroka Seyrê".

Nîşe

- Derwêşo, dibêjî diya wî Hiznoşê. İmirqesifyo. Ma min negotibû ti carî zirt û porta li xale xwe Teyarê Qetran meke. Hawara hazar û haftsad malê Êzîdxana. Rabin nama bîşiyênin ser eşfrê giran. Namê bîşiyênin heta Wêranşehira xopan, ser İbrahim paşa, namekê ser Diyarbekrê, ser mala Cemîl paşa, namekê ser Yemenê, ser Fêris begê, namekê heta pişta Bexdayê, ser Hadîyê Dexfl axa, namekê ser Cizêrê, ser mala Bedir Xana. Belkî bicivin li quntara çiyayê Êzîdxan, barstika kurê min Derwêş axa ji destê birayê min Teyarê Qetran derxînin. "Ji çfroka Xezala Kurda".

Nîşe

Dibê Mihemed begê mîrik ji yê Bohta bû. Muso jî yek ji xulamê wî bû. Mihemed begê çavresayîk avêtibû Muso, kuştina wî dabû ber çavê xwe. Lê destê wî nayê milê Muso de wî bikujî.

Dibê Mihemed begê rabû bakire Zeynal begê, mîrê Muşê, Hecî Ebas, mîrê Kelhapozreşê, Saqulê Berwarî û tev axa civandin. Tedbfra xwe di oda xwe de danîn, de Muso odê de bikujin. "Ji çfroka Muso".

Nîşe

Dibê Kîkf paşa heft birayê Menca Elîyiyê Sêlim axa avêtiye zindana xwînîya. Mencê bi cêrike xwe re diçî gel mazinê eşfrê Kurda, de birayê wêna ji zindanê derxin. Dibê Mencê dêsi diçî gel Hiseyn axa, bavê Silstanê, begê koçerê zozana. Piştra diçî gel Bişarê Kolo, qewalê Êzîdfîya û mazinê heft hazar Êzîdfîya ji wir diçî gel Ferho axa, ferxê Izêr axa.

- Keko Ferho axa, dibêjî Mencê. Min xwe li nav û dengê Ferho axa, ferxê Izêr, beranê zozana, keliha mehkum û xwînîya girtiye. Ez ne ketime ber girtinê. Girtin girtina mère, qeyd xilxalê şêra ye. Îroj duwazdeh rojin, heft birayê min, ne mér kuştin, ne mil firandin û ne kerwanê dewletê şelihandin. Ketine zindana bedena bajarê Diyarbekrê. Ez ketim bextê xwedê û te, tê birayên min ji destê Kîkî paşa, ji xwedênenasî derxî. "Ji çîroka Menca Elîyê Sêlim axa".

Bi van nişa diyare ko axa her tim di hevkarî, piştdayinê de ne. Bi vê hevkarî û piştdayinê rista xwe yî eşîrtiyê heta îroj didomênin. De hêj gewîn bibî ji hevkarî û piştdayina dewletê serdest jî di ser ve dixin.

Nîşe

- Ew keça ko te dîtî xuha me ye, got birayê Mencê î mazin. Ma emê bidine yekî ji te çêtir. Tu îroj li keliha bedena Diyarbekrê Walî yî. Em mîra bikujin, mila bifirênin, tu karî afwa me bêni. Bi xwedê em nadîn yekî ji te çêtir. Emê bidine te. "Ji çîroka Menca Elîyê Sêlim axa".

Daxwîyana axa

Di çîrokêne me de tevgerin hene ko gotinêna wana jî dilê yekî dixelênin. Lî axa bi hêsayî wana gotine. Dîsa di çîrokan de xedarîn hatine kirin. Ew xedarî enceq li bejn û bala axa tê. Xweruyinin hene em wana di tev axa de dibînin. Gelê me vana gelek xwes û zelal diyar kirin e. De em wana xwes binasin.

Nîşe

Menca Elîyê Sêlim axa xwe li mazinê eşîra girt. De heft birayê wê ji zindanê derxin. Dema ko Hiseyn axa çav li xweşkayî û delalîya Mencê kir, tev rayê bebabiyê ji enîya wî rabûn.

- Katunê, got Hiseyn axa. Ezê nûha rabim herim, li ser bajarê Diyarbekrê bigrim, bajar di serê Kîkî paşa de bênim û heft birayê te ji zinda-nekê berdim. Lî divê tu mehra xwe bi temamî bidî min. "Ji çîroka Menca Elîyê Sêlim axa".

Ser vê gotinê Mencê rabû ji kon derket. Çû gel Bişarê Kolo, qewale ê-zîdfîya û mazinê heft hazar Êzîdfîya.

- Katuna min, got Bişarê Kolo. Heft hazar konê Êzîdfîya li vir hene. Ezê eşheda her heft hazar kona li ser destê te bênim. Ezê rabim herim serê Kîkî paşa bênim, li ber te deynim. Lî divê tu mehra xwe bidî min. "Ji çîroka Menca Elîyê Sêlim axa".

Nîşe

Dibê Elîyê Mehmed keçapa xwe Seyrê xatun ravand, bir kelha Gomanîyê, gel îşkanê Gulixan. Dema ko îşkanê Gulixan çav li Seyrê kir, hema çû destê xwe disitûwê wê de anî, kaba xwe ser kaba Seyrê danî û dewisand.

- Sê wadê xwedê li wî canî ketibî, got îşkanê Gulixan di dilê xwe de. Ezê tiştîna bênim serê Elî, wî mîhvani. Ev goştê berxika, ev goştê nazik ji ku anî li ber koka diranê min danî. Ezê işev Elîyê Mehmed biku-jim. Ezê Seyrê xatun deynim ber wî canî. "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê dema ko çavê Tahir begê li narencîyê ket, eqil û sewda di serê wî de nama.

- Bi xwedê, dibêjî Tahir begê di dilê xwe de. Ew kaça wî bî, ew buka wî bî, ew jinbira wî bî, ew jina wî bî, ezê jê bisitênim. "Ji çîroka Narencîyê".

Xedarîya axa

Di çîrokêne me de xedarîn ji alîyê gelê me hatine diyarkirin ko kirina

wana nayê bîra yekî de bîkî. Lê axa, mîr û beg van xedarîya kirin e. Ev xedarî de em ruwê axa xweş binasin di çîrokê me de cih girtin e.

Nîşe

Dibê Qol Qasim cezma îskanê Gulixan ji piyê wî deranî. Destê wî bi duvê haspê ve girêda. Doma sê seata gêra histirîya pê kir. Piştra anî li ber xwe danî. Bi xencerekî çavekî wî deranî. Têra çaroxekê ji pişta situwê wî jêkir. Çengê wî bi saxî şikênan. Ji dilê xwe re wî da bér şûr û xencerâ. Laşê wî avêt ji kuçik û tajîya ra. Serê wî jêkir danî xurcezîna xwe. Bi vî awayî heyfa kurapê xwe Elîyê Mehmed hilanî. "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê Eloyê Sêxanî rabû li revê deriyê odê çalikik da kolandin. Hiseynê Gizfr û Mihoyê Qeysanî di wê çalikê de çikand. Çar pênc kuçik xistine mezelekê. Derfî li wana girtin û heft roja nan nedana wana, av şanî wana nedan. Pişti heft roja çiqas pazê jar hebû, gurandin. Ur û pizurê wana avêtin ser serê Hiseynê Gîzîr û Mihoyê Qeysanî. Derfî li ber kuçika vekirin. Kuçik dema ko çav li wan ur û pizura kirin, êrifî wana kirin. Dest bi xwarinê kirin. Di vê navîyê de lêv, guh û bêvîlê wana ji xwarin. Serê wana weke du kumika li wir hîstîn. Wana di çalikê de temam kirin. "Ji çîroka Eloyê Şêxanî".

Tirsonekîya axa

Tirsonekî her tim xweruyîyek axa ye. Gelê me ve tirsonekîya axa di çîrokê xwe de xweş diyar kirin e.

Nîşe

- Zarono, got Qol Qasim. Heçî kesê weke îskanê Gulixan ne, ziravê wana ziravê rîvîya ne. Ko win bêjin wê bi me ra şer bikf, em wî bikujin, an ew hina ji me bikujî, ew nîne. Ko têderxî, wê bikevî qulekê, ko hazar salf em lê bigerin, em wîna nabînin. Vêca, divê em bi meqamekî wî bixine destê xwe. Nexwe nakevî destê me". "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê Evdila begê, birayê şêxê şamara, Ehmed axayê millî di xew de bîrîndar kirîye, û ravandîya wî Meryem xatûnê ji xwera birfîye. Ehmed axa xwe girand êla Evdila begê. Li terş û talanê wî xist. Evdila begê xwe gihand hawara terş û talanê xwe. Evdila begê berî şer di zîvirî xulamekî xwe.

- Here bêje wî kesî, got. Hege welitekî ji min dixwazî, ezê bidimê. Bere berê xwe ji ser talanê min bidî alîkî. "Ji çîroka Ehmed axayê millî".

Nîşe

Dibê bezirganê dewletê ji bonî sitandina bêsa êla Emer begê nezîkayî daye êlê. Siyamend bûye heza êle, hatîye li tanga rîya bezirgan, serê rima xwe berdaye erdê û berbendî bezirgan rawestfiye. Dibê bezirgan ji dûr ve çav li Siyamend kir. Zîvirî xulamekî xwe.

- Here meyzê lawo, got bezirgan. Wî siwarik li rîya me rawestfiye. Here gel wî kesî. Hege mîrin kujtibin, jinin ravandibin bi adetê, hatîbi dawa tiştekî li me dikf, xelatekê bidîyê. Bere xwe ji rîya me bidî alîkî. "Ji çîroka Siyamend û Xecê".

Em karin van nîşa hêj zêdetir bikin. Gelê me di vê sedemê de ji gelek nîşe diyar kirin e. Bi sadan çîrok ser wana ji me ra hîstîn e. Dengbêj, çîrokbêj û tanburvanê me li gotinê girik bi xwe ve nehiştin e. Lê belê em dibînin ew kez hêj hene û em bi evîna wana, bi tirba bavê wana sund dixwin.

İNLEYEREK AKIYOR DİCLE İLE FIRAT

Bira

Uluslararası en ileri, çağdaş düzeye vardıkları günümüzde Kürt halkı zorlu bir yaşam svaşı vermektedir. Açı içinde kıvranan bu halk, ölüm kalım mücadelesi içindedir. Türkiye ve Kuzey Kurdistan'da (T), sefaletin olduğu, enflasyon hızının gün geçtikçe arttığı göz önünden. Halkın ürettiği geçim kaynaklarını, cunta ucuz bir şekilde elinden kaptırdığı gibi, alım gücünden de etmekteidir. Kürt halkı, Türk burjuvazisinin fabrika üretimi ayakkabı, şeker, elbise vb. önemli mallarını da alamamaktadır. Hele hele et ve meyve gibi ateş pahası besin maddelerini zor alabilir. Geçim zorluğu, köylereden çok şehirlerde görülmektedir. Çünkü emeğini satarak geçimini sağlamaya çalışan işçilerin gelirleri, olsa olsa ev kirası ve bit pazarı'ndan bir kaç parça giyim eşiğine yeter. Köy durumu ise bundan farklı. Kira vermediği gibi, senelik geçim kaynağının çoğunu da kendi üretiyor.

Kurdistan'dan bazı bölgelerde köylüler, "Şal ü Şapık" denilen giyim elbiselerini de kendileri üretiyor. (Bunu bile Kürt halkına çok bulan Türk devleti, bu elbiselerin yapım ve giyimini yasal olarak yasaklıdı. Sömürgeci devletin bu kararına uymayan köylülerde cezalandırılıyor.) Kürt halkın senelik geçim kaynağını, kişilik etini bile hazırladığı ve sakladığı bilinmektedir. Ama, son zamanlarda generaler cuntası işi iyice azitmışki, askerini Kurdistan'ın her tarafına, hayatın her alanına saldırtmaya başladı. Öyleki, Türk devleti, Kurdistan'daki insanların ağızlarındaki lokmayıda çok bularak, kuduran it gibi önüne gelen her şeye saldırıyor artık. İçinde bulunduğu ayın ilk haftasında, Şehire inen altmış kadar köylü, katır ve atlarına bugday yüklemiş köylerine dönmektediler köyleride yüksek dağ yamaçlarında olduğundan sene den sene şehrre bir veya iki sefer inen bu insanlara rastlayan Türk askeri, işkence yapıyor ve tutukluyor, bunun yanında bugday yüklerini talan ediyorlar. Tarihte eşeine az rastlanır tipten olay ve işin ılgıç yanı şu ki mal talanı, insanlara işkence ve tutuklama yetmediği gibi hayvanlarıda hapis alıyorlar. Yani kissaca söylenilirse, Türk devleti, Kürt insanını ve aynı zamanda hayvanını tutuklama insafsızlığındadır. Barbarlığın başka ayrı taraflı var mı acaba? Şayet generaler cuntasının Hürriyet, Ter cuman ve benzeri gazetelerinde böylesi bir haber yayınlanırsa, hiç şaşmamak

gerektir. "savcı ve hakimler dağlarda yuvalanmış devlet düşmanı teröristlere erzak taşıyan 60 bölücü-komünist at ve katırı idama mahküm etti."

Kurdistan, tüm olarak Türk ordusunun görülmemiş baskısı altındadır. Son zamanlarda yoğunla insan göz altına alınıyor, işkence görüyor. Sınır bölgelerinde topla ma kampları kurulmuş ve bu kamplarda vahşi bir baskı uygulanıyor. İnsanlarımıza zoraki göce zorlanıyor. Yüz bin insanın fazla bir kitle, yani 53 köy devlet zoru ile batıya göç etmeye mecbur bırakıldı. Bu 53 köyün insanları kürt oldukları için göce zorlandı. Başka suçları yoktur. Onların yerine de, yani sınır bölgelerinde Türkiye'nin batısından, Türkiye'ye göç eden "Türk asıllı" göçmenleri, devlete "sadık" insanları veya Afganlı göçmen yerlestirecek, ya da mayın döşeyecek.

Bu arada, Kurdistan'da zulmün baş kalesi durumuna gelen zindan ve hapishanelerdeki tutukluların durumu ne? Türk ordusu, Jirki aşiretinden yoğunla insanı meydan işkencesine çekerse, suçsuz çocukların oynasılığı o köylere hava saldırısı, evet paraşüt ile ani bir saldırısı yaparsa, kürt olmasından başka hiç bir suçu olmayan o zavallılara akla gelmedik işkençe yaparsa, Diyarbakır zindanlarındaki Kürt yurtseverlerine, şanlı bir şekilde direnen o militanlara nasıl davranışır?



KURDISTAN, ÇEND

ABORÎ Û

SEDEMÊN PELİXANDINA GELÊ KURD

1. Sedema aborî

Tevayiya erd û binerdê Kurdistanê pirr dewlemen e. Ev dewlemendî pirr cihê ye: petrol, bi hêzanf li Kurdistanana Iraqê (Kerkük û Mûsil), krom, hesin, sifir, komir

Li ser de jî, çiyayêن ku piraniya wan bidar in, tevî ziraet û xwedîkîrina lawiran, serweteke tabîfî ji bo welêt ava dikan.

Li gel vê qasê, welat pirr xizan (feqîr) e. Her çar hikûmetên Tirkîyê, Iranê, Iraqê û Sûriyê, ji gelek salan de bîryar stendine ku vê navçeyê di rewseke pirr paşketî de bi-hêlin. Pirâniya van dewlemendîyan ber bi navçeyên cîran ên ne kurd têñ ajotin. Tu infrastruktur ne hatiye ava kirin. Sinaet hema tu neye. Nîse: karê petrola Kurdistanana Iraqê ne ji Kurdan re ye. Xamê hesin ê Divrigi, li Kurdistanana Tirkîyê, ber bi senayiêن hesiniyêن tirk (Eregli, Karabük), li ser Deryayê Reş, têñ ajo-tin.

Kurdistan mêtîngeheke rast e ku mad-deyêن wê yêñ xam û karkerêñ wê ji aliyê van her çar hikûmetan têñ bi kar kirin.

Bêbextiya Kurdan ew e ku ew ji aliyê welatêñ ku bi xwe jî ketine bin destêñ hêzên sermayedar hatine talan kirin. Ev tişt rewşa Kurdan ji ketîna wan, rast bi rast, bin destêñ hêzên mezinêñ aborî zortir û tevlihev-tir dike.

2. Sedema stratêjîk

Kurdistan di Rojhilata Nêzîk de ci-hekî stratêjiyekî pirr giring stendiye. Ew çaryaneke di nav bera Rojhilat û Rojavayê.

Ji bo vê yekê, serfiraziya serhil-daneke kurdfî ji bo hêzên mezin pirr bi tehlîke ye, ji bo ku ewê hemî navçeyê tevlihev bike û menfaetêñ

aborî û leşkerî yêñ van hêzan biguerfine.

Jî alfîkî din jî, ev hêz naxwazin ku pirsa.kurdîf bî carekê yemire, ji bo ku, gaya ku pêwist bibe, ewê wê dijminêñ xwe bi kar bfnin.

3. Sedema idêolojîk

Weka di piraniya welatan de, bi hêzanf di Cihana Siyemîn de, serdestêñ gelê kurd di bin tesîra bermayıyêñ idêolojiya sedsala 19a de mane. Imperatorî bû dewleteke navendî. Di vê dewleta navendî de, bitenê çand û idêolojiya merivêñ ku di hikmê de neten nas kirin. Etniyêñ din pêwist e şexsiyet û çanda xwe nizanibin û xwe têxîn bin şovenîzma van nijadparêzan.

4. Sedema taktîkî

Ew zordestî gengaziyeke (wasite) taktîkî ye ji bo ku bala tevayiya xelkê ji pirsên wî yêñ aborî û cîvakî dûr bixin. Bi germkirina merivêñ nezan dijî Kurdan, bi xurtkirina kînê û bi danîna vegetandina etníkî û olî, ev hikûmet digihêjin amancêñ xwe, ango, ew di hikmê de dimînin û ji xelkê re pirsên giranêñ civakî - ji bo demeke kurt - tînin ji bîr kirin.

REWŞA ABORÎ Û CİVAKÎ Lİ KURDISTANË

KURDISTANA TİRKİYÊ

Bi aqareke 230.000 km², Kurdistanana Tirkîyê 30% ji axa tevayiya welêt ava dike.

Xwedîkirina lawiran:

Awayê wê kevnar e û ew ji tevayiya fealiyetan şaxeke giring e. Kurdistanana Tirkîyê ji Tirkîyê re çêlek, bizin, mî û maddeyêñ lawîrf bi dereca bilintirîn temîn dike.

NOT Lİ SER JÎNA

ÇANDÎ - III

Pervîn

Çandin:

Pembû, pincar, tutun Ev madde ji bo bazarê tirkî û sinaetê tê Çandin.

Serwetên binê erdê:

Fosfat, komir, sifir, hesin, krom, petrol. Bfrêni kromê li Maden (li nîvî riya Diyarbekir û Elazigê) tê kolandin. Ew ji mezintirfnêni bfrêni cihanê ne. Bikaranfna wan (832.000 ton di 1967 de) firset da Tirkiyê ku di cihanê de bibe "produktor"ê duymîn (pişti Sovyétistanê) ê kromê. Li gora O.C.D.E. Tirkîye, di 1973 de, gihaşt 2 milyon ton û wan bi hêzanfî ji Emerîka re firot. Xamî hesin li Divriqi tê derxistin. Bikaranfna wî digihêje 1,5 milyon ton. Pişti derxistina wî li Kurdistanê, ey xam ber bi senayîn tirkî, li ser Deryayê Res, tê ajotin. Sifir li Ergani, nêzîki Diyarbekrê, tê derxistin: 1 milyon ton di 1970 de. Petrol: şirketên multînasional (Shell, Mobil, B.P.) ku li Kurdistana Tirkiyê dixe-bitin her dem digotin ku li wira petrol tu neye. Lî, di salêni 60an de şirketa netewiya tirk, T.P.A.O., li Raman, Garzan (Siirt) û Diyarbekrê, petrol dit. Di 1971 de, "produksyon" gihaşt 4 milyon ton.

Riyên stratejîk:

Ew ji alîkî Tirkiyê, İranê û Iraqê girêdidin hevdû û ji alîkî din jî qışleyen leşkerî ku li Kurdistanê bi cih bûne digihênin hevdû. Girintirfînêni qışleyen bajarêni Kurdistanê (Erzurum, Diyarbekir, Malatya, Elazig û Van) girêdayî şebeka riyên trênan a tirkî ne (riyên İstanbul-Ankara-Malatya-Diyarbekir-Kurtulan; Van û Ankara-Sivas-Erzurum). Ew xwediyêni meydanêni balefirêni leşkerî û sîvîl in jî.

Sinaet:

Ew, bi piranî, cihêni besît û hunera destî ne: fabrifqêni sabûn, zeyt, xâliçê, ên paqijkirina şekir (li Elazig û Malatya), çend fabrifqêni çîmento (Qars, Erzurum), ên tutun (Bitlis, Malatya), ên qumas li Diyarbekrê.

Di 1964 de, ji 43.263 şirket, fabrifqêni piçûk û destî û atelyeyen Tirkiyê, bitenê 2.427, aango 5,6% (1) li Kurdistanê bûn.

Nisbeta sermaya xusûsi (ne a dewletê) pirr nizm e. Di 1968 de, bi tenê 1,93% ji şirketên bênav (anonymes) li Kurdistanê dixebeitin (2).

Di dawiyê de, em karin bêjin ku pêwendiyêni aborî û bazarî nav bera Tirkiyê û Kurdistanê pêwendiyêni mêtropol-mêtingeh in, ji bo ku Kurdistan ji Tirkiyê re xezîneke maddêni xam û di eynî zemanî de jî bazareke sereke ji bo çekirina maddêni sinai û van maddêni xam ava dike.

Sistema banqî pirr hindik pêş ve ketiye. Di 1965 de, ji 1.981 de, şaxêni banqêni ku li ser erdê Tirkiyê vebûyî bûn, bi tenê 179, aango 0,9%, li Kurdistanê bûn (3).

Ziraet

Li gel hebûna serwetên tabîfî, civaka kurdfî paşdemayftirfna civakêni Tirkiyê ye. Ew, di dereca yekemîn de zirafî ye: 72,2% ji gelhê bi ziraetê mijûr dibe. Sinaet bitenê 5,5% ji gelha "aktif" distîne. Di bajaran de, Kurd bi ticaretê û bi hunera destî mijûr dibin û di dayirêni cihê de kar dikin (4).

Teknîka zirafî pirr kevnar e, li gel mîkanfîzmebûneke piçûk ji 1965 de: 39% ji gîsinêni ku li Tirkiyê bi kar

(1) Statîstika 1964 (bi tirkî), D.I.E. - Ankara

(2) D.D.K.O., weşanêni Dava Dosyasi, Komal, Ankara 1975, rûpel 173

(3) (eyni)

(4) jimartina giştî ya gelha 1970 (bi tirkî)

tên û bi tenê 3% ji aletên zirafî li Kurdistanê ne.

Paykirina erd qet ne weka hev e:

ÇÎNÊN GUNDÎ	% JI GELHA GUNDÎ	% JI ERDÎN KU EW KONTROL DIKIN
Gundiyêñ bê erd	38	-
Xwediyyêñ erdêñ piçûk (1-50 donim)	45,4	27
Gundiyêñ dewlemed (51-200 donim)	14,2	40
Axa, şêx, (ji 200 donim bêtir)	2,4	33

Ango, ⁶ ₁₀ ên xwediyyêñ erd ³ ₄ erd sten-dine, ¹⁰ 38%êñ gundiyan tu erdê wan tu neye.


Çfna piçûk a karkeran, 5,5%, xwediyyê bext (nesîb) e, ji bo ku ew ji çend zagonêñ (qanûn) temfîna civakî kar di-kin. Di salêñ dawîn de, ev rews jê re hisyarbûneke piçûkeke çînfî da.

Di gundêñ çiyayî û di nav eşîrêñ nîv-koçer de, gelhe ji quhartina maddêñ

lawirî li hemberî maddêñ çêkirî: şe-kir, çay, mucâwhî, lîstik û ca-rîna jî li hemberî meywe (fêkfî) û şînayî (sebze), dijîf.

Dayirêñ resmî, 1%ê gelha aktîf a Kur-distanê, û bi piranî di karêñ ne baş (nîzm) de, bi kar tînin.

Dûmahî heye



Bi dengê teqîna tivingan re hişyar bû. Herdu çavêن xwe firkand, ji nav nivînan rabû û bazda hewşê. Gava ku çav li leşkeran ket, dîsan bi pas de baz da hundir.

Jina wî û herdu zarokên wî hîn di xew de bûn. Mêrik çû ber paçê, hêdfî perde da alî û ji der ve nihêrfî. Dîfî ku komek mirov li qadê (meydan, hol) hatine civandin, destêن wan li ser serêن wan û di nav leşkeran de ne. Mêrik dîsa hêdfî perde weke berê kir û li hundir vegeriya.

Jina wî weke ku mirov zixtikan lê bixe ji nav nivînan pékiya, xwêdana ser çavêن xwe paqij kir, bi tirs û bi heyecan ji mérê xwe re got:
- Min çi xewnek ne bi xêr didit!

Lê xewna xwe ji mérê xwe re negot. Mêrik li ber serê wê, li ser tûtikan rûnişt û jê pirsî:
- Xêr e insaleh, te çi xewn dit?

Jinikê axînek kûr kişand û got:
- Tu bi a min bikî ez nabêjim.

Mêrik ifcar hebekî wa bi hêrs got:
- De bêje ha! Xêr e, ma te çi xewn dîtiye, ku te evgas xwêdan da ye? Tu hertim xewnêن wisa tewlo-mewlo û bi ecêb dibînfî. Xwedê zane tu dîsan di ser çiyan miyan re difiriya!

Jinik ji xwêdanê weke ku mirov satilek av bi ser de birjîne, sil bûbû. Piştfî ku bi dawa xwe xwêdana ser çavê xwe paqij kir got:
- Na malixerabo, min dît ku leşkeran tu dikust.

Hingî bi yek derbê re çokên mîrik sist bûn, canê wî sar bû û xwêdanek cemidî ew girt. Tevfî li ser tevziyê li dila ket û tirsa mirinê lê peyda bû. Pênc salan xwînfî û li çiyan mabû, tu caran tirsêن wisa li wî peyda nebûbûn. Dû re bi dengekî nîvqurmiçî ji jina xwe re got:
- Ma tu zanî, ku leşkeran girtine ser taxê! Ew li ku bin wextî bigirin ser mala me jî.

Ji tirsan û heyecanan zimanê jinikê negeriya, di cihê xwe de sar ma.

Mêrik dîsan got:
- Keğê, Welleh xewnêن te carna rast in! Te wê dema han xewn dîfî, ku cîranê me Xelo miriyê, sibehê em ra- bûn, ku ew bi rastî jî miriye. Ev

xewna te jî ne rast be? Welleh ez jî çer vê sibehê çav li wan ketim, tirsa mirinê kete dilê min. Ez bi rastî jî nême kuştin?

Jinikê bi dengekî hebekî bilind got:
- Hela his be, bila devê te ji xêrê vegere gidî! Ma çi ye tu vê sibehê qala mirina xwe dikî? Ev çi sibehek ne bi xêr!

Mêrik bersiv neda. Keserek kûr berda û cigarek vêxist. Piştfî ku hebekî fikirî, ji jinikê re got:
- Rabe zû ji min re qatek kincêن xwe derxe, leşker li ku bin wextî bigirin ser me. Welleh ku ifcar ez bê me girtin berdana min tune.

Jinik hema zû ji cihê xwe pekiya û ber bi sindoqa xwe ya kincan çû. Kîrâsekfî dirêjî, derpiyek û hubiryek jê derxist û anî danî ber mérê xwe.

Mêrik qederê deqfqekî li wan kincan nihêrfî. Piştfî ku cigara xwe di xwe- lidankê de vemirand, dîsa rabû ser xwe, çû hebekî perda pacê da alî û ji der ve nihêrfî.

Ew girtînan hîna jî destêن wan li ser serêن wan û di rêzê de bûn. Leşker tivingêن wan di destêن wan de bûn û li dora wan bûbûne xelek.

Mêrik perde bi hêrs berda û dageriya hundir. Zû zû ew kincêن ku jina wî jê re dörxistibû li xwe kir û çû ber neynikê (mirêk) li xwe nihêrfî. Piştfî dîfî ku kinc lê têن, jina xwe hemêz kir, zaroka xwe ya di xew de beyf ku hişyar bike maçf kir, rahişt du satilêن avê û derket.

Erê kincêن jinan li xwe kiribû, lê ji meşa wî dîsan mirov zanibû, ku peya ye. Taxa wan tije leşkeran mirov nikanfbû gava xwe biavêta. Mêrik bi wî awayf di nav leşkeran de derbas bû. Gava ku bi çend gavan ji wan bi dûr ket, hubirya wî ji serî de ket. Ku daqûl (xwe tewand) bû rahêje hubirya xwe, leşkeren gule ajot ber devê tivinga xwe û got:

- Di cihê xwe de raweste, tev nelive!

Mêrik li peyvîn leşker guhdarî nekir, rahişt hubirya xwe û bazda. Du leşkeren din jî gule ajotin ber devê tivingêن xwe, ji wî nîşan girtin û

DÎROKA KURD Û KURDIŞTAN

- VI

Derwêş

Rêwşa Kurdan di dewra Safewîyan de

Ilhanfyan û Karakoyunluyan hem bi hevra şerr dikir û hem ji dixwest axa Kurdistan têxin bîn hakimiyeta xwe. Dema ku Karakoyunluyan zora Ilhanfyan birin, êrifşen xwe bir ser navçen Mukrî. Di vê dewrê de pir' kes dey ji cihê xwe berdan û ji navçê bazdan. Zilm pir' xesar diða wan.

Hê ev birfinênuh sax ne bû bûn êrifşen Moxolîyan dest pê kir. Têmurleng gel pir' diêşand. Paş ku wî êrifşen xwe li ser gelên dora Kurdish qedandin, dest bi talana Kurdistanê kir. Navçen Mûsil, Diyarbekr, cizir ûhwd. İsgal kîrin. Navçen din ji talan kîrin û weha berê xwe da Hakarî û Wanê û bi talanê çû aliyê Kafkasya.

Têmurleng lawê xwe Celaleddin Mîran Şah wek walîyê Kurdistan tayîn kir. Lawê wî ji wî bi xwe di alîyê zilmê de ne kêmter bû. Hinek navçeyên Kurdistanê ku li ber vê hêza biyanî serê xwe hilda bi ser ne ketin. Ji ber vê yekê Têmurleng bi xwe di sala 1401 de vege riya Kurdistanê û qetlameke mezin kir. Li Kurdistanê bes navça Bedlisê ji zilma Têmurleng xelas bû bû. Ev ji, ji ber ku Şerafeddinê Bedlîsfî sadiqîya xwe pêşanî Têmurleng kiri bû.

Di sala 1405 de Têmurleng dimre. Amirê Karakoyunluyan ku xwe ji tirsa Têmurleng veşarti bû çû ba Şerafeddinê Bedlîsfî û arîkarin jê xwest. Wî, li cem arîkarinê keça xwe ji dayê ku Amirê Karakoyunluyan Yusuf dewleta xwe ji nuh ve saz bike.

Lê di sala 1431 de lawê Têmurleng Şahreh Mîrza dest bi êrifşen li ser Kurdistanê kir. Lê wek her car pir' ji amîren Kurdish çûn ba wî û sadiqîya xwe dan zanîn. Di nav van amiran de, Şerafeddinê Bedlîsfî, Amirê Hakanî Ahmed, ê Hasenkêfê Amir Xelîfî hebûn.

Di vê navberê de dewleta Akkoyunluyan çê bû. Dewleta Karakoyunluyan xera kir û dest bi şerrê Kurdish kir.

Di demeke kurt de piraniya navçen Kurdistanê îsgal kir û xist bin hakimiyeta xwe. Ne ku hêza hikumdarê dewleta Akkoyunluyan ji ya Kurdish pir'tir bû. Akkoyunlu yek hêz bûn, iê Kurd parçê parçê bûn. Li hemberê dijmin hevûdu ne digirtin. Uzun Hasan, amîrê dewleta Akkoyunluyan merîvekfî pirr xapfnok bû. Wî Kurd pirr bi hêsanî di ber hev da dirakirin û şer' di nav wan de derdixist. Eşîrên Dumîlî û Dembîlî ku hev pir' êşandin du mîsal in ji bo vê yekê.

Safewî dikevin hole

Paş ku Şah Ismaîl hat serê dewleta Safewîyan dest bi êrifşen Ermeniyan û Akkoyunluyan kir. Bi karakoyonluyan re dostanî girêda ku karibe êrifşen xwe berdewam bike. Li ser cihê ku êrifş dikir, talan û kuştin dibûn. Paş ku Şah Ismaîl navçen Ermenî û ên Akkoyunluyan talan kîrin dest bi êrifşen Kurdish kir. Safewî şîf bûn û ji ber vê yekê ji Kurdish aciz bûn. Zilma ku wan li ser Kurdish dikir ji ya hêzên din mezintir bû. Eger em nişekê ji bo vê yekê bidin, paş zilm û talana ku Safewîyan kir, ll amîren Kurdish çûn ba Şahê Safewîyan ji bo ku sadiqbûna xwe jê ra bêjin û vê talan û zilmê rawestfnêne. Lê Şahê Safewîyan, Ismaîl ev her ll amîren Kurd avêtin zîndanê. Ev amîren Kurd 3 salan di zîndanêni wî da man. Di cihê van amiran de Şah Ismaîl walîyêni şîf tayînê nava Kurdish dikir. Di şerrê amiran de Şah Ismaîl walîyêni şîf tayînê nava Kurdish dikir. Di şerrê Çildîranê (1514) de ku dewleta Safewîyan qels bû û ya Osmaniyan bi ser ket ew her ll amîren Kurdish azad bûn û vege riyan cihêni xwe. Ji ber ku Osmaniyan di navçê de dixwest ku di cihê şîf de sunîtiyê bêxin nava Kurdish. Kurdish ev firset bikar anî. Idrîsê Bedlîsfî li cem Osmaniyan bi awakî xwes dihat qebûl kîrin. Ji ber vê yekê ji Osmaniyan di vê demê de weha zilmeke mezin li ser Kurdish ne kir. Lê, Sîltan Selîm ji Kurdish leşker di da sazkîrin ku di hemberê Safewîyan de karibe şer'ekî xurtir bike. Idrîsê Bedlîsfî ev yek pêk anî û ji Kurdish hêzeke pir' mezin saz kir. Şerrêni ku

di navbera Osmanî û Safewîyan de çê-di bûn tev li axa Kurdistanê bûn. Ji ber vê yekê Kurdan hem ji can û malê xwe dibûn, û hem jf ji bo hêzên xerfîb şer' dikir. Amir, Beg û gîrgirekêن Kurdan di vê navberê de di cihê ala xwe da ala Osmanîyan bilind dikir. Ev jf bi kêfa Siltanê Osmanîyan dihat.

Di arfkariya Siltanê Osmanîyan de Idrîsê Bedlîsfî roleke pir' mezin dilist. Ji ber vê yekê Osmanîyan ew gîringtirfn kes li Kurdistan ûlan kiri bûn. Paş ku di şerrên hember Iraniyan de hêzên Kurdan arfkarineke pîrr mezin dan Osmanîyan, Siltan Selîm, 17 alên Osmanî û 500 hedîgar ji begêñ Kurdan re rê kirin. Ev hedîgar hatin ba Idrîsê Bedlîsfû û wî ev hedîgar belav kirin. Cidayî vê yekê jf, ji Idrîsê Bedlîsfî ra, 25.000 zêr hatin rîkirin.

Ji ber ku Kurd sadiq man û ku ji bo dewleta Osmanîyan bi can û mal şerr dikir, Osmanîyan ev maf dan Kurdan:

- 1- Parastina beglikêñ Kurdan yêngîrêdayî dewleta Osmanîyan.
- 2- Begîftî û amirtî wê ji bav çê kur. Lî hemî tişt, biryar û ferman di bin destê Padîşahê Osmanîyan de ye.
- 3- Pêwfist e ku Kurd di hemî şerran de arîkarina Tirkan bikin.

4- Tîrk jî wê arîkarina Kurdan bikin eger hin hêzên biyanî êrîşî Kurdan bikin.

5- Pêwfist e Kurd vergiya (bêş) xwe bê kîmasî bidin Osmanîyan.

6- Ev levhatin di navbera Siltan Selîm û Emîrlikêñ Kurd de hatiye çêkirin.

Ev levhatin di sala 1514 de çêbûye.

Ji bo ku hakimiyeta navçê xwestir bibe, Şêx Idrîs Diyarbekr kir 19 sencak. Li Urfa û Mûsilê jf eyîf tişt kir.

Di vê dewrê de Idrîsê Bedlîsfî kari bû piraniya Kurdan bike yek û hêzeke bi qewet saz bike. Wî dikarî hînga dewleteke Kurdan bi vê hêzê saz ke. Ji ber ku ew di wê demê de ji aliyê piraniya Kurdan bi qedr û qîmet dihat dftin. Lî wî ev yek ne kir û girêdayî Siltanê Osmanîyan ma. Di Cihê ku welatekfî ji bo gelê xwe biparêze, welatê xwe bi xwe, bi gelê xwe bi xwe, ji bo hêzeke biyanî, dewleta Osmanîyan diparast. Wî hem gelê xwe û hem jf welatê xwe ji bo Osmanîyan pêşkes kir.

P.S.: Di jimara bê de em nama ku Siltanê Osmanîyan Selîm, ji bo Idrîsê Bedlîsfî re şandi bû çap dîkin.

Dûmahî heye



Siwarêñ Kurd

Elisée RECLUS

Nouvelle Géographie Universelle, la Terre et les Hommes, Paris 1884

HEVPEYVÎNEK Bİ DR. QASIMLO RE



Berê çend heftan, Dr. Qasimlo, sekreterê giştî yê P.D.K. û Iranê, hatî bû Belçika û di teleyizyonâ flamanî de peyivî bû. Têkoşer ji vê ziyare-tê kar kir ji bo ku ji Dr Qasimlo çend pirsan bipirse:

Pirs: Rewşa Kurdistana û Iranê ya rêzanî (siyasî) çawa ye?

Bersiv: Li Kurdistana û Iranê ev çend sal e şerr e. Hûn dizanin ku li dijî rejîma Xumeynî em karin şerr bikin. Ev ne tişteki mezin e. Di nav dewleta û Iranê de em otonomiyê dixwazin. Li Ewropa, ji me dipirsin: "Hûn gi dixwazin?". Em dibêjin: "Em otonomiyê dixwazin". Ji me re dibêjin: "Çawa ji bo otonomiyê hûn şerr dikin?". Felsefa Xumeynî otonomiyê qebûl na-ke. Dilxwaziya me ji bô û Iranê Démokrasî, ji bo Kurdistanê Otonomî ye. Lî li cem Xumeynî ne dêmokrasî heye û ne otonomî. Dîsa me ne dixwest em şerr bikin. Lî Xumeynî dijî me şerr flan kir, li cihanê. Şeş mehan me muzakere bi Ayatullahan re kir. Lî, wan ne xwest tu heqekî me bidin. Ev çend sal e em şerr dikin; rewşa me ne xerab e. Bi tenê li Kurdistana û Iranê em karin li hemberî Xumeynî şerr bikin. Bajar bi roj di desten wan de ne, bi şev di bin kontrola me de ne.

Çiya û gund di bin desten pêşmergan de ne. Ez bawer im ku emê heqê xwe bistînin.

Pirs: Têkiliya Partiya we bi rêzanî din re çawa ye?

Bersiv: Rêzana Kurdistana û Iranê ya mezin Komele ye. Ew xwe marksist-lênnînist dibêje. Em pê re xebatê dikin. Carina ne xwesî di nav bera me de çêdibin, lê em nahêlin mezin bibin. Em karê xwe bi hev re dewam dikin. Grû-pêñ din ên biçûk hene, ji û Iranê hatîne nav me. Bi mîvanî li cem me dimînin, ji bo ku li wan cihêñ din rê ji wan re tu neye. Bir û baweriyên me ne yek in, lê dîsa ji em bi mîvanî li wan dinêrin. Bi rêzanî din ên Iraqê, ên Tirkîyê re dan û stendinê me xwes in. Hin hene ji ne rêzan in, eşîret in. Kurên Barzanî li gel Xumeynî ne. Em naxwazin bi wan re şerr bikin, lê ew dijî me şerr dikin. Em dibêjin em otonomiyê dixwazin, lê belê mana vaya ne ew e ku heqê me ji bo serxwebûnê tu neye. Çawa Kurdân Tirkîyê û Iraqê heqê wan ji bo serxwebûnê heye, ew heq ji bo me ji heye. Eger em divîn alîkariya gelê Salvador bikin ku ew bigihêje heqê xwe, çawa em vaya ji bo Kurdân Tirkîyê û Iraqê nexwazin? Di eksê wî de, daxwaziya

me gelek e. Em dixwazin alîkariya Kurdêن Tirkiyê û Iraqê bikin. Lê dîsa ji em naxwazin têkiliya karên wan û ew ji têkiliya karên me bibin.

Pirs: We xwe çawa da pejirandin (gebûl kirin) li Kurdistana ïranê?

Bersiv: Partiya me ne partiyekê ciwan e. Sala ku bê ewê partiya me bi-be 40 salî. Wê, di dema Komara Mahabadê de û piştî wê tecruba xwe kiriye. Wê karê xwe di zemanê Şah de kiriye û di şes salên piştî Şah de ji me xebata xwe ne sekinandîye. Partî, her gav, li daxwaziya xelkê guhdarî kiriye û li gora daxwaziya gel mesiyaye. Helbijartin çêbû. Partiya me ji dengan (rayan) %85 û di cihne de %90 wergirtin.

Pirs: We çawa casen ku di nav we de ne anîn rê?

Bersiv: Pirsa casan pirseke tarîxî ye. Dijminê me ji wan her gav istifade kiriye. Li Kurdistana ïranê, nisbeta casan kêmîtir e. Piştî pênc salan ew pirr kêmîtir bûn. Ji bo çi yek dibe cas? Yan ji nezaniyê, yan ji aaliyê siyasî kêm e, ya feqîr e ji bo pere dike. Cas xeterekî mezîn e, ji bo ku ew riyên Kurdistanê û cihan pirr baş nas dîkin, rê nîşanî Pasdaranê Xumeynî û dijminê me dîkin û alîkariya wan dîkin. Go cas bikevin destê me, em zû bi zû wan naberdin. Ên ku carek dibin cas û posman dibin, em cih didin wan, lê ne du caran.

Pirs: Pirsa mezintirîn çi ye li Kurdistana ïranê?

Bersiv: Em ji bo otonomiyê şer dîkin. Ji her tişt bêtir, ji me re pere û çek pêwist e. Lê, heta nuha, çekên me hene, lê perê me nîne. Ew ji me re pirr pêwist e. Xebata me pirr dûr û dirêj e. Ji bo me pirsa stratêjîk, li hundur yan li derva be, pirr giring e. Li derva, pêwist e em bala xelkê bikişînin pirsa Kurdistanê û ji wan piştgirtiyê bixwazin. Ji me bê ji em ji hikûmeten wan alîkariya maddî û manewî wergirin baş e. Ji me re organîzasyon pirr muhim e. Go organîzasyon, pere û çekên yekî hebin, tu tişt xwe li ber meriv nagire. Lê çek û pere nebin zor e. Berî hemî tiştî, organîzasyon ji bo hemî xebatê gelekfî pêwist e.

Pirs: Em zanin ku hûn otonomiyê ji bo Kurdistana ïranê û Dêmokrasiyê ji bo ïranê dixwazin. Sebebê vaya çi ye?

Bersiv: Tecruba me di tarîxê de nî-

şanî me dide û em zanin quweta me çi ye, weka Kurdêن ïranê. Li Kurdistana ïranê ku heqê me federalî be em fêdêralîzmê dixwazin. Lê, ji gelêñ ïranê yêñ din kesek fêdêralîzmê naxwaze. Hin ji wan ji otomiyê na-xwazin. Ez bawer im ku ji bo neslê me ji Kurdistanê re otonomî, ji ïranê re dêmokrasî dibe. Ji bo neslê ku ew bê dilxwaziya wî fêdêralîzm û serxwebûn be, çi dibe, ew daxwaziya wî ye. Partiya me ji 1971 de, di bernama xwe de ji bo otonomiyê xebat dike. Em nuha bêtir naxwazin.

Pirs: Li ser şerrê Iraq û ïranê dî-tina we çi ye? Rewşa we çawa ye?

Bersiv: Em dijî şerrê Iraq û ïranê ne. Zor kes hatine kuştin. Ev şerr li Kurdistanê ji dibe. Wan Kurdistanê wêran kir, bi bombe û topêñ her du aliyan. Ev şerr ne şerekî baş e. Em aşftiyê dixwazin. Zor kes dibêjin ku aşîti çêbibe ewê ji Kurdan re ne baş be. Lê, ev ne rast e. Hin dibêjin ku aşîti çêbibe, Xumeynî ew bêtir leşker bişîne Kurdistanê. Ez difikirim ku ew nikare zêdetir leşker bişîne Kurdistanê ïranê. Cih bêtir tune. Sed hezar sed hezar in, du sed hezar du sed hezar in. Bêtir cih nagrin. Paşê firoke û tank li Kurdistanê bi kar nayêñ û kar nakin.

Pirs: Eger şerrê Iraq û ïranê raweste, ewê rewşa Kurdistanê çawa be?

Bersiv: Eger şerrê ïran û Iraqê raweste, dibe ku Xumeynî bêtir leşker bişîne Kurdistanê. Lê, heta ku Cumhuriyeta İslâmî heye, dostanî bi Iraqê re çenake. Çêbike ji, belkî li-heyhâtinekê çêbike. Weka berê, ew tiştîkî mezintir çenake ji. Çiyayêñ Kurdistanê hene û pêşmerge tê de sekinîne û em bi gelê xwe bawer in. Şerrê me pêş şerrê ïran û Iraqê çêbûye, li hemberî rejîmê Xumeynî.

Pirs: Çima Xumeynî dixwaze şerr dewam bike?

Bersiv: Xumeynî dixwaze şerrê Cumhuriyeta İslâmî "exporte" bike. Ew ji felsefa islamî ye. Eger rojek hat ku Xumeynî şerr nexwaze, wê çaxê ew felsefa xwe inkar dike. Sebebêñ din ku Xumeynî naxwaze şerr rawestîne: pênc şes milyon bêkar hene. Ew ji wan re dibêje bira şerr raweste; 2,5 milyon awareyêñ şerr hene, tiştîkî wan tu neye, mal û cihê wan tu neye; 1,5 milyon Afganî hatine, kar dixwazin, cih dixwazin. Karkerêñ ïranê heqê wan ji zemanê Şah pirr kêmîtir e. Herkes çi bixwaze, jê re dibêjin raweste, nuha şerr e, bila şerr bi-

KONSER A KURDÎ-TÎRKÎ LÎ BRUKSEL

Konsera ozanên binay û deng, yên gelên Kurd û Tirk, di bîn nayê."Stranên me Dost in", di 24 mijdare de, li Bruksel, bi awakf şad hat saz kîrin.

Tevîf koma muzîkê, Şivan Perwer û Melike Demirag, berê ku bêñ Bruksel, li Elmanya jî stranên şoressêrî û gelerî pêşkes kiri bûn. Ev konser ewê li welatên din ên Ewrupa bê çê-kîrin.

Li Belçîka, di konsera ku Têkoşer saz kir, nêzîkî 600 kes besdar bûn şevê. Kurd, Tirk, Ermenî, Suryanî, laz û Belçîkî gihan hev û biratiya gelan nîşan dan. Bi her parça ke stranan re civak şah dibû û bi oza-nan re distira.

Koma muzîkê bi awakf pirr xwes lê-dixist û konserê delaltir dikir. Di eyîf zemanî de jî, diapositîf hem Kurdistanê û hem Tîrkiyê nîşan di-dan û li ser wan wergerandina (ter-cume) stranan bi ingilîzî xuya dibû. Hevaleke me ya belçîkî jî wergeran-dinê bi zimanê fransizî, bi mikro, dikir.

Strana ku Melike û Şivan bi hevra distira "Dostno merheba", stranên Şivan "Kîne em?", "Canê Canê", "Xe-

zala Çiyayê Şingalê" û strana nuh li ser şoressa azadiyê li çiyayê Agîrî "Agîrî"...., li cem stranên Melike, "Ellerimiz", "Isimsiz Kahramanlar", "Gelecek Günler", civakê di şahiyeke mezin de hişt.

Her du ozanên mezin çend stranên gelerî hem bi Kurdfî û hem bi Tîrkî bi hevra digotin. Melike her cara ku stranek gelerî yan bi Şivan ra yan jî bi tenê distira, û eslê wê stranê kurdfî ba ji guhdaran ra di-da zanfn ku ev stran ji kurdfî hatîye kopye kîrin. Vê yekê jî konserê bêtir xwes dikir.

Bi kurtf, konsera Bruksel ji aliyê saz kîrinê û naveroke bûyereke pirr hêja bû. Ev konser dostanî û biratiya ku di nav gelên me de mimkin e nîşan da.

Herkes xwedîyê şexsiyet û hebûna xwe, bê ku çandêñ kurdfî û tîrkî tev-lihey bibin, bi çîranetiya dîlpak û bî biratî.... Hemî yan sifetan di vê şeyê de xuya dikir. Em hêvî dîkin ku ew her dem saz bibin.

Televizyona belçîkî, besê fransizî, besdarfî vê konserê bû û ewê roja şemiyê, 29.12., saet 12.30-13, vê şe-vê nîşan bide.



BRÜKSEL 'DE KÜRT-TÜRK KONSERİ

Kürt ve Türk halklarının meşhur devrimci halk ozanları Şivan Perwer ve Melike Demirağ'ın "Türkülerimiz kardeşir" adını taşıyan konseri, Kasım ayının 24'ünde Brüksel de coşkuyla verildi.

Şivan Perwer ve Melike Demirağ müzik gruplarının eşliğinde Almanya'nın çeşitli kentlerinde devrimci türkülerin yanında, halk türkülerini de içeren müzik konserlerini vermektedirler. Kürt, Türk, Ermeni ve diğer milliyetlerden de işçilerimizin kitlesel olsarak dinlediği bu konserler, çeşitli Avrupa ülkelerinde de düzenlenmektedir.

Belçika'da Tēkoşer'in organizasyonunu yaptığı konser Kasım ayının 24'ünde Brüksel'de düzenlendi. 600 den fazla bir kitlenin izlediği bu konserde, Belçikalısı, Kürdü, Türkü, Lazı, Ermenisi ve Süryanisi büyük bir ilgiyle izledi, Dayanışmada bulunarak halklarının kardeşliğini gösterdi, çalınan her parça halkın yaşamının bir parçası olduğundan kitle coşuyordu.

Müzik gurubunun ozanlara ustaca e'lik etmesi, gerek Kürdistar ve gerekse Türkiye'den manzara içeren, diya-pozitifler, çalınan parçanın ingilizceye tercüme edilmesi ile birlikte gösterilmesi, Türkçe ve Kürtçe anlatımlıyan diğer dinleyicilerin programı anıtlarına yardımcı oluyordu. Bunun yanında, direk olarak fransızca mikrofon ile tercüme yapılyordu.

Melike Demirağ ve Şivan Perwer'in birlikte

söyledikleri "Dostlar Merhaba" Şivan'ın kitleler tarafından büyük ilgi toplayan "Kine Em, Canê canê, Xezala Çiyayê Singalê Yeni bestelediği; Ağrı dağındaki özgürlük işyanı parçası "Agirî" ve çeşitli halk türküleriley; Melike Demirağ'ın söylediği parçalarдан "Ellerimiz, Isimsiz Kahramanlar, Gelecek Günler" ve çeşitli halk parçaları, seyirci kitlesini şaha kaldırıldı. Halk türkülerinin bazlarını da beraberce söyleyen ozanlarımız, kürtçelerini ve türkçelerini karşılıklı çalışıyorlardı.

Halk türkülerinin söylendiği sıralarda Melike Demirağ Türkçe söylediği türkülerin bir kısmının Kürtçe olduğunu bizzat vurgulayarak bunun farkına daha sonra vardıklarını söyledi. Karşılıklı söylenen türküler geceye ayrı bir renk katıyordu.

Sözün kısası Brüksel'de düzenlenen "Türkülerimiz Kardeşir" konseri organize ve içerrick bakımından güzel bir şey idi. Bu konser halkların arasında dostluk ve kardeşliğin vazgeçilmez olduğunun ispatı idi.

Hiç bir kültürün diğer bir kültürün içinde eritmeye kalkışmadan eşit değerlerle yan yana herkesin kendi benlik ve özdeğerlerini koruyabileceği bir şekilde dostluk ve kardeşlik için bir örnekti. Şivan ve Melike'nin konseriümüzdeki olsun bu kardeşlik ergeç gerçekleşecek.

Aynı geçen konser 29 Aralık 1984 tarihinde RTBF-1 Liège televizyonunda yayınlandı.



SERBUHURIYEK BI YILMAZ GÜNEY RE

Torî

Di têkoşîna guhertina dinyayê de her şaxê hunermendî destkarekî hêja ye. Bi wan destkaran hunermend hizirê "dûşunce" xwe, tewrgotinê "yorum" xwe f li guhertinê digihêjênin komnetewoka.

Begomaninema ji yek ji wan destkara ye û ji firça wênekara, ji qelema nivîskara, ji ber ko digihêjî gelek kesa, hêj dijwartir e. Yilmaz Güney ger bi pirtükên xwe, ger bi film û senaryoyê xwe hunermendekî hêja bû û weke her hunermendê pêşverû, di guhertina dinyayê de cihê xwe girti bû û hunermendiya xwe bi piranî bi sinema pêk tanf û di vî warî de, bê miqeresî xwe dabû pejirandin. Navê xwe li tev welatan dabûbihîstandin.

Weke her hunermendî, rêçikke hunermendiya Yilmaz Güney hebû. Pêşî rêzanîya çînîya karkeran, cohtkaran rêçikandi bû. Di filme xwe de cih dabû kesenê vê çînîyê. Piştra, berê qemera xwe vegerand ser Kurd û Kurdistan.

Belê, Kurd bû Yilmaz Güney û di birewerîya gelê xwe de bû. Lewman dînake din li guhertinê ji xwe re bijarti bû piştra. Ew dinya, dinya ko gelê wî i Kurd lê ne. Ew dinya ji hunermendiya xwe re kiri bû sedem. Pêşî bi filma KERÎ "SÜRÜ" dest ayêti bû vê dinyayê. Piştra bi filma RE "YOL". Lê bi van herdu filma, li gora dilê xwe dest neavêti bû birîna gelê xwe yî xopan. Diva bû ko vê birînê qenc der bikî. Çi heyî têde derxêñî holê. Bi vê armancê di navê ÇİYA "DAG" de senaryoke nû nivîsandi bû. Diva bû bi vê senaryoyê gelek tiştâ di derheqî gelê xwe de bêjî. Lê, di girtixanê de bû û zaneyîya wî yî di derheqî gelê wî de gelek kêm bû. Vê kêmanîya xwe goti bû hevalekî me herduwa. Ew heval min salox dabûyeyê. Ser vê saloxdanê vabû ko em hevdu bibînin.

Roja şemîkê, pişti nîvro, ez û ew heval, em çûn gel wî. Wê rojê des turdayî bû. Ji girtixana îmrali hati bû İstanbulê. Dema ko em çûn, pi reka wî yî hêja Fatos ji li wir bû. Bixêrhatin dame pişti ko cih li ru niştinê nîşeyî me kir. Ew jipiya ma.

- Ji ber ko ez bi te ra bi Kurdi na axivim, bibhure, got. Ez jî Kurdeki weke te me, lê zimanê xwe yî dêmakî nizanim.

Ez li ber dilê wî rabûm. Min daxwazîya wî jê pirsî.

- Birayê delal, got. Ez nizanim xebêre xwe duvdirej bikim. Ezê bi kur Tayî bêjim. Min senaryoyek amade kir. Ez divêm ko bi vê senaryoyê gelê me bidim nasandin. Bi hêvîyê xwe, bi keser û kulê dilê, bi kevneşopiyê xwe, bi jiyanâ xwe wê di vê senaryoyê de cih bigrin. Lê wî tu rewşa ko ez iroj têde dibînî. Di gel vê rewse, ez gelê xwe xwes nas nakim. Min biqasî pêncîh pirsî ji te ra amade kir. Ezê wê senaryoyê jî bidime te. Pêşî senaryoyê bixwêne. Piştra bersiva wan pirsâ bide. Lê bere ev pirs te negirêdin. Tu û dilê xwe. Tu çawa bivîyî, wilo bitevgere. Heftik mohle ji te ra. Pişti heftikî din, emê difsa hevdu bibînin. Hingî emê li ser senaryoyê dûr û dirêj biaxîvin. Lê berî vêna, ji ber ko gelek tişt ji nûha ve di senaryoyê de cih ne girtin e, ezê bi dev têdeyîya "îcerik" senaryoyê bêjim.

Min çîyayek ji xwe re kiriye sedem. Ew çîya, ji wan çîyayê Kurdistan û bilind e. Berf, mij û moran her tim ji ser wî çîyayî kêm nabî. Dever nadî ko yek ji ser bibhuri. Wê salê berfeke giran barîye. Her der di bin berfê de ye. Di ber wî çîyayî de gundekî me heye, ji wan gundê Kur distan. Di navê Mîrxan de zilamek li wî gundî dijî. Kurê Mîrxan Şêxo nexwesîya wî giran e. Gundî Mîrxan ji wan derman û hetwanê pîrefbîya saloxî Mîrxan dikin de bidî kurê xwe. Lê Mîrxan guh nadî gundiyyê xwe. Bajarik li wî rexê çîyê heye. Li wî bajarik de pisîşk "doktor", nexwesxane û dermanxane hene. Mîrxan divê ko kurê xwe bibî wî bajarî, gel pisîşk. Lê wî ew çîya li ber e. Çîya bilind e. Rê û rêçik nadî û di ser de jî, gundi ne bawerin ko wê karibin ji wî çîyayî bibhurin alîyê din. Lê Mîrxan ne di hizira "dûşunce" wana de ye. Ew bi çi awayî bî, diva bû kurê xwe bibî wî bajarî û bawer e ko wê karibin ji wî çîyayî derbas bibin. Lê wî bitenê ye. Bitenê jî nikarî ji wî çîyayî bibhurî. Ko

gündiyê wî li gel bin, wê bihurtina çiyê sehl bana. Mamostek li wî gun-dî heye. Ew jî di dîtina Mirxan de ye. Ez jî li gel van herdu kesa me. Ma ne ew e ko, rizgarî, azadî, ser-firazi li pişta wî çiyayî ye. Ew ne çiyayik, deh çiyayê wilo li ber me bî, rojekê wê di vî çiyayî de dever vebibin, Kurd û Kurdistan wê azad bibin.

Vêca birayê delal, divê bi arîkariyâ te ez wan gundiya xweş nas bikim. Rewşa wan fî aborî, rêzanî û civakî tu xweş bidî min. Tu çîya û gundekî wilo ji min ra bibînî. Wêneyê wî çiya, gund û gundiya bikişenî, dengê wana bixî qeseta û ji min re bêni. Ez zanim, karê giran wê li ser milê te bî. Tu çi devêyî ji min. Fermo bêje.

Min wîna di vê yekê de pîroz kir û mekîneke wêna, teybik û çend qasête vala jê xwest. Di çûyin û hatinê de wê dirav pêwist bana. Hejmara wan dirava ji min pirsî. Min dirav jê nexwest. Ser vê yekê li pîreka xwe zîvirî.

- Fatos, got. Wî tu gelê min dibînî. Ez bawerim ko rewşa vî kesî fî diravî ne baş e. Wê parîyê devê xwe û zarokê xwe qut bîkî û rîyî de bidî.

Çavê wî tijî bûn. Serê xwe berda ber xwe. Qasekî di wî rewşî de ma. Berfî ko li çûyinê ez rabim. Daxwazîke min fî din hebû. Min va ko ez wê daxwazîyê bêjim.

- Hege wê ev senaryo weke senaryoya filma KERÎ vêl bî, wê hindik tiştî bidî, min got. Ez keseke navser im. Min di wan rîya de ne dawestêne.

Piştîra min dûr û dirêj rexneyê xwe yi li derheqî filma KERÎ gotinê. Bê-deng guhdarî li min kir. Piştîra serê xwe rakir.

- Tu rastî, got. Lê min gote te. Ez gelê xwe xweş nasnakim. Di wê senaryoyê de jî hevalik Kurd arîkarî da min. Kêmaniyê heyî ne yên min in. Li gora agahdarîya wî hevalî min ew senaryo amade kir. Lê bi vê senaryoyê ez wêna nakim. Ezê navê te têde bêjim. Gerek min di wê senaryoyê de jî bigotana. Lê min nekir. Lewma min rexne dîkin. Lê qet mitale meke. Hetta ez erêkirina te nesitênim, dest bi filmê nakim.

Min xatir ji wana xwest. Em bihurfin mezeleke din. Bakire karbidestê sitidyoyê Erol. Daxwazîyê min gotinê. Di wê navfîyê de çend kesne din li wir runıştî bûn. Yek ji wana rabû. Baskî me de hat.

- Çend pirsê min jî wê ji vî hevalî hebin, got.

Tu nabêjî ew kes rejîsorê filma RÊ "YOL" bû. Di vê senaryoyê de wê zilamik hebana. Ew zilam di girtixa de ye. Jina wî kesî ji rî keti bû. Ew kes desturdayî wê herana mala xwe. Xezuranê pîrekê biryara kuştina pîrekê dabûn. Lî, li berbendî mîrê wê mabûn. Diva bûn mîrê wê kuştina pîrekê bianfyana cih. Zilma wê herana malê. Wê jina xwe li haspakî siwar bikirana. Bibirana serê çiyayekî. Di wî çiyayî de wê berf hebana. Wê ew kes û jina xwe ji sermayê bikirana ko bi qulifin. Wê hasp bi kuştana. Zikê wî haspî wê bigelaştana û ji ber qufilandinê wê biketana zikê hêsp. Bi wî awayî wê ji qufilandinê rizgar bibana. Jê û wêde wê paya herana. Ew kes bi payayî wê çawa li ser berfê herana. Rejîsor divabû ko vêna ji min fîr bîbî.

Ez pêşf li ber kuştina pîrekê rabûm. Ya baş ew bû ko mîrê wê, wê bibî mabbavanê wê û li wir berdî. Ya duyemîn, ger pîrek li haspê suwar nebana. Heyjinik jî zanî ji bonî kuştinê wê dibin. Wê çawa li haspê suwar bibana. Ya sêyemîn, ez li ber kuştina haspê ji rabûm. Berf û bager li holê hebû. Ew kes rîya xwe nedidîtin. Bere hasp ji latekê dawerqîyaya xwar, li wir bimirana. Bere hingî zikê hêsp biqelaştana û neketana zikê hêsp. Bere bitenê dest û lingê xwe bixistana zikê hêsp. Piştîra bere urê hêsp biqelaştana, dest û lingê xwe bixistana nav rîxa urê hêsp. Bi vê yekê emê ji kuştinê rizgar bibana. Min nediva bû ko navê me li mîrkujî derkevî.

Di vê axaftinê de Yilmaz Güney jî guhdarî li me dikir. Piştîra min bi-hîst ko senaryoyê RÊ li gora rexneyê min hatîbû guhertin.

Heftik di holê de bihurt. Min dîtinê xwe yî derheqî senaryoya ÇİYA û sedemîn ko di vê senaryoyê de cih bigrin nivîsand. Ew nivîsandin qederê dosyakê girti bû. Roja yekşemê ez çûm gel karbidestê sitidyoyê. Dîsa pîrekâ wî Fatos, ew karbidest û çend kesî ko wê di filma RÊ de leyizin, em li keştiyê "gemi" suwar bûn. Em berbi girtixa Imrali ve çûn. Girtixa Imrali li giravik "ada" di nîvî deryaya Marmara bû û bitenê li wir girtixa hebû. Me nêzîkayî da Imrali. Lî nehiştin ko keşti herî gel Imrali. Wê rojê dîtina girtiya qedexe kiribûn.

Tu nabêjî ji bonî rakirina Yilmaz

X E B A T A M E

28 İLON

Rêveçûn û mîting li Bruxelles, dijîf hatina serokê partiya faşîsta fransız, LE PEN (hejmar 25 binêre). Di vê xebata hêja de, hemî partiyên belcîkî, ji xeynî partiya libêral, sendîka û komelên belcîkî û biyanî besdar bûn.

2 MIJDAR

taziya helbestvanê mezinê geleriyê kurd Cigerxwîn li Stockholm, Swêdê (rûpel 4 binêre).

3 MIJDAR

Festivala biyaniyan li bajarê Anvers. Em bi raxistina pirtûk, brosur û setêñ kurdfî besdar bûn.

8 MIJDAR

Rêveçûneke mezin li ber sefaretxana şîlfî, dijîf rejîmî faşîst ê Pinochet û dijîf polîsî belcîkî ku berê heftekî, di munasebeta protêstokeke pirriçûk li ber eyñî sefaretxanê, bi awakî hov li çend şîliyan bi daran xisti bû.

21 MIJDAR

Civîn bi serokê belediya St-Josse re, tevî komelên ku di vê belediyê de dixebeitin. Em li ser pîrsên komelan û li ser fîrkirina zimanêni biyanî di dibistanêni vê belediyê peyivîn.

22 MIJDAR

Civîna Coordinationê ji bo amadekeke rîneke mezin li Marcinelle, li ber monumana karkerên biyanî, bi hêzanî ftalî, ku ji sedema hilweşana bîrê komirê (maden) miri bûn. Amanca vê bîranîyê protestokirina rîzana hikûmeta belcîkî ya dijîf karkerên biyanî û malîyê wan e.

24 MIJDAR

Şeva çandiya mezin ku me li Bruxelle amade kir û ku tê de Şivan û Melike Demirag, tevî koma xwe ya mûsfqî, bi hunera xwe ya pirri xwes û bilind, civakeke mezin di gelek şahiyê de hiştin (rûpel 28 binêre).

6 KANÛN

Civîna Coordinationê ji bo amadeke-

rîna rêveçûna Marcinelle.

11 KANÛN

Civîna Komîta Belcîkî ji bo Parastîna Mafêñ Mirovatiyê li Tirkîyê. Ev Komîte dixwaze di nêzîk de xebateke hêja ji bo nasandina rewşa Tirkîyê û Kurdistanê bike. Awayê vê xebatê ewê di civîneke nêzîk de bê tesbit kirin.

BEREVKIRINA DOKUMANAN LI SER KURDAN

Ji bo firehkirina pirtûkxana Têkoşer (li lîsta dokumanêni me, di Bilan 1983 de, binêre) me dest bi xebateke nuh kir. Di her du mehîn Cotmeh û Mijdarê de, me dokumanêni jîrîn ji zanîngeha U.L.B., li Bruxelles, derxist:

Bîbliyografiya giştî:

- Encyclopédie de l'Islam
Dictionnaire Géographique, Ethnographique et Biographique des Peuples Musulmans.
Paris, 1927
- Encyclopédie de l'Islam
Nouvelle Edition
Paris, 1981
- Studia Iranica
Supplément 1-6
Abstracta Iranica
Département d'Iranologie de l'Institut Français de Téhéran
1978-1983

COGRAFYA, DÎROK Û ETNOLOJÎ:

- Nouvelle Géographie Universelle
Elisée RECLUS
Hachette, Paris, 1884
- Les Fondements Géographiques de l'Histoire de l'Islam
Nouvelle Bibliothèque Scientifique Flammarion, Paris
- Les Kurdes et le Droit
Lucien RAMBOUT
Paris, 1947
- Türken, Kurden und Iraner seit dem Altertum
Egon Freiherr Von Eickstedt
Stuttgart, 1961
- Les Races et l'Histoire
Eugène PITTARD
Paris, 1924
- Destin du Proche-Orient

- Pierre RONDOT
Paris, 1959
- L'Afrique et l'Asie
Revue Politique Sociale et Economique
Paris, 1959
- L'IRAK
Origines Historiques et Situation Internationale
Thèse pour le Doctorat en Droit
E. NOLDE
Paris, 1933
- l'Irak des Révoltes
Pierre ROSSI
Seuil, Paris, 1962
- Esquisse d'une Histoire de Nader-Chah
V. Minorsky
Société des Etudes Iranianennes et de l'Art Persan
Paris, 1934
- La Perse au XVe siècle entre la Turquie et Venise
V. Minorsky
- Société des Etudes Iranianennes et de l'Art Persan
Paris, 1938
- ZIMAN Ú BÊJE:
- A Kurdish-English Dictionary
Taufiq Wahby and C.J. EDMONDS
Oxford, 1966
- Poésie Populaire Kurde (6 cild)
bi kurdfî "sorani" û farisî
Institut d'Histoire et de Civilisation Iranianennes
Tabriz
- GERR (SEYAHET):
Residence in Koordistan
C.J. RICH
London, 1836
- O L (DÎN)
Le Zend-Avesta (3 cild)
James Darmesteter
Librairie d'Amérique et d'Orient
Paris, 1960

KUŞTİNA KARKERÊN KURD Ú TÎRK Lİ FRANSA

Roja şemiyê, 11 mijdar 1984, karbidestekî xwediye fabriqeqe fransiz li Epêne - Fransa karkerekî kurd, Kemal Ozgün, 20 salf, kuşt. Roja dinê, 12 mijdar 1984, li Châteaubriant, li Bretanya, nijadparêzekî cuhan û bêkar ji pacâ çayxaneke tirk, bi tifingê, heft derban avêt nêzîkî 15 karkerên tirk ku li hundur rûniştibûn. Dûdu ji wan, Salih Kaynar, 40 salf û bavê du zarokan, û Abdullah Yıldız, 38 salf û bavê şes zarokan, mirin. Pêncine din jî birîndar bûn.

Karkerê kurd ji aliyê patronê xwe hat kuştin, ji bo ku ew merivekfî sendikîyekî aktif bû û ku mercen xebatê di fabriqeqe de qebûl ne dikirin. Du karkerên tirk jî bi destê nijadparêzekî bêkar hatin kuştin.

Ev cinayeta mezin gelek kesan di şasîyê de histin. Serokê Komara Fransa, F. Mitterand, li ber laşê Kemal Ozgün xwe xwar kir. Lê serokê Eniya Netewî, partiya faşista fransiz, Le Pen, dilxwesiya xwe bi vê yekê venesart: "Em amade ne ku çekan hilgirin ji bo ku em Fransa ji hilwesanê biparêzin"!

Weka vê bûyerê, bûyerên dinêñ giran li welatêñ Ewrupa, û bi hêzanî li Almanya Federal, çêdibin. Ev nîşan dide ku hêzên rast, nijadparêz û faşist ji bo ku kûrbûn û tehlika krîza aborî û bêkariyê ji xelkê veşêrin, bi çekê nijadparêziyê û dijminayıya karkeran, biyaniyan dikujin û yan êrifî wan dikan.

Pêwist e em sedemêñ xurtbûna van hêzan baş nas bikin û dijî wan her dem, bê rawestan, çavekirî bin û têkoşfnê bidin.

TÊKOŞER'DEN HABERLER

28 Eylül 1984

Fransa'da faşist ideolojinin temsilcisi olan partinin başkanı LE PEN'nin faşist gerici Brüksel Schaerbeek belediye başkanı NOLS'u ziyaret etmesi üzerine yapılan protesto yürüyüşüne akti olarak katıldık. Adı geçen yürüyüşe Liberal partisi dışında tüm partiler yanısıra tüm Belçikalı yerli ve yabancı örgütlerde katıldı. Protesto yürüyüşünün bitiminde yapılan mitingte, Belçikada İnsan Haklarını Savunma Komitesi Başkanı DE KOCK, MRAX (Irkçılık ve Yabancı Düşmanlığına Karşı Mücadele Örgütü) Başkanı Bayan JOSPA'da birer konuşma yaptılar.

2 Kasım 1984

İsveç'in Stockholm şehrinde ölen Kürdistanın en büyük şairi CIGERXWİN'in cenaze törenine bir temsilci ile katıldık.

3 Kasım 1984

Anvers şehrinde yapılan Yabancılar Festivaline kitap standımız ile katıldık.

8 Kasım 1984

Sili'nin büyük elçiliği önünde faşist Pinochet rejimini protesto etmek için büyük bir gösteri düzenlendi. Bu tarihten bir hafta önce, yine küçük bir gösteri sırasında, Belçika polisi rejim aleylektarı göstericilere saldırmış, birçok kişiyi gözaltına almıştı. Yürüyüşte Pinochet rejimi yanısırı, Belçika hükümetinin tutumunda kınandı.

21 Kasım 1984

St. Josse Belediye Başkanı ile belediye sınırları içinde bulunan yabancı örgütlerle yapılan toplantıya katıldık. Okullarda resmi diller yanısıra anadili üzerine de durduk ve yabancıların sorunlarını dile getirdik.

22 Kasım 1984

Koordinasyon komitesi tarafından, bir kaç yıl önce çöken maden ocağında ölen ve çوغuluğu İtalyan olan işçilerin anısına Marcinelle şehrinde yapılacak yürüyüşü görüşmek için yapılan toplantıya katıldık. Bu münasebet ile Belçika Hükümetinin göçmen işçilere karşı politika ve mali zorlukları protesto edilecek.

24 Kasım 1984

Tekosér tarafından organize edilen Şivan ve Melike Demirag'ı müzik gurubu ile katılıkları büyük kültürel gece 600 den fazla bir kitlenin sevgittiği konserde Kürdistan mutfağını tanıttık. Kitap standımız büyük bir ilgi çekti. Kürt, Türk, Ermeni, Süryani ve Laz'lardan oluşan topluluğun yanısıra Belçikalıların da zevkle izlediği gece büyük bir ilgi topladı. İlgili açıklama için "Brüksel'de Kürt-Türk Konseri" başlıklı yazı bakınız.

6 Aralık 1984

Koordinasyon Komitesi ile Marcinelle'de yapılacak yürüyüşü gördük.

11 Aralık 1984

Türkiye'de İnsan Haklarını Savunma Komitesi tarafından Türkiye ve Kurdistan'da son gelişmeler ve sorunu tanıtmak için program taslağını görüstük.

KÜRTLER ÜZERİNE YAZILMIŞ BELGESEL KİTAPLARIN TOPLANMASI

Tekosér, kitaplığını genişletmek için yeni bir çalışmaya başladı. (Daha önce yayınladığımız 1983 yıllık raporumuzda arşivimizde mevcut dökümanlarımızın listesini yayınlamıştık). Ekim ve Kasım aylarında Bruxelles ULB üniversitesinde yaptığı araştırmalarda aşağıdaki listede yazılı belgesel kitapları bulup fotokopilerini kitaplığımıza aldık.

Genel olarak bibliyografya

-Encyclopédie de l'islâm
Dictionnaire Géographique, Ethnographique et Biographique des peuples musulmans.

Paris, 1927

-Encyclopédie de l'islâm, Nouvelle Edition, Paris, 1981

-Studia Iranica, Supplément 1-6, Abstracta Iranica, Département d'Iranologie de l'Institut Français de Téhéran, 1978-83

Coğrafya, Tarih ve Etnoloji

-Nouvelle Géographie Universelle Elisée RECLUS, Hachette, Paris, 1884

-Les Fondement Géographiques de l'Histoire de l'islâm, Nouvelle Bibliothèque Scientifique Flammarion, Paris

-Les Kurdes et le Droit

Lucien RAMBOUT, Paris, 1947

-Türken, Kürden und Iraner seit dem Altertum
Egon freiherr Van Eickstedt Stuttgart, 1961,

-Les Races et l'Histoire Eugène PITTARD, Paris, 1924

-Destin du proche-orient, Pierre RONDOT Paris, 1959

-l'Afrique et l'Asie, Revue politique Sociale et Economique, Paris, 1959

-l'Irak, Origines Historiques et Situation Internationale, Thèse pour le Doctorat en Droit, E. NOLDE, Paris, 1933

-l'Irak des Révoltes, Pierre Rossi, Seuil Paris, 1962

-Esquisse d'une Histoire de Nader-Chah, V. Minorsky, Société des Etudes Iranianes et de l'Art Persan, Paris, 1934

-La Perse au XVe siècle entre la Turquie et Venise, V. Minorsky, Société des Etudes Irianiennes et de l'Art Persan, Paris, 1938 Dil ve Edebiyat

-A Kurdisch-English Dictionary, Taufiq WAHBY and C.J. EDMONDS, Oxford, 1966

-Poésie Populaire Kurd (6 cild, Kürtçe, "sohranca" ve Farsça), Institut d'Histoire et de Civilisation Iraniennes, Tabriz

AVRUPA YA DİNİ GÖÇ

Yalçın

Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nı ziyaret eden; Dünya Katolik Kiliseler Birliği temsilcilerinin girişimiyle Belçika ya ilk dini mülteciler gelmeye başladı. Önceleri bazı kiliselere bağlı sosyal-servislerin, kızılhaçın yardımlarını alan dini sığınmacılar akının boyutlanması ve Belçika hükümetinin de bazı tedbirleri almasıyla paniğe kapıldılar. Dini sığınmacılar kendi kendileriyle başbaşa kaldılar. Yabancı dil bilmedikleri sorunlarını anlatamadıkları için zorluklar çektiler.

Türkiye Kürdistanı'ndan gelen bu göçün içüzü:

Türkiye Kürdistanı'nda ziraata elverişli en iyi köylerde yaşayan ve bölgenin en zengin, zanaatın tüm dallarını, ticareti ellerinde bulunduran Ermeni ve Süryanilerin göçü bölgelerde büyük bir boşluk ve işsizlik, durgunluk yarattı.

Yaşadığı yörede en güçlü ağaların himayesinde olan bu azınlık ve etnik gurupların üzerinde gerçekten bir dini, ikincisi azınlıkta oldukları için baskılar vardı. Dünyanın her tarafında çoğunluk azınlık gurupları, etnikleme baskılar uyguluyor. Baskının dozu kimi yerlerde fazla, kimi yerlerde de az oluyor. Doğanın bir kanundur bu. Fakat Kürdistan'da bu etnik guruplara uygulanan baskı Kürt halkı adına yapılmıyor. İslamiyet adına ve ağaların sömürü mekanizması adına yapılıyor.

Çoğu yerlerde köle muamelesi uygulanan ve hatta kız alıp verirken (bölgenin ağaları arasında) Hristiyan kökenli bir kölenin de başlıkla beraber diğer tarafa verildiği gerçeği. Uygulanan tüm baskı, haksızlıklara rağmen Kürdistan'da çeşitli Kürt aşiretlerinin tüm insanlarından da fazlaraigbetleri olduğu da gerçektir.

Bir gayri müslimin (Ermeni, Süryani, Kildani, Yezidi'nin) değerinin Ağanın yanında daha fazla olmasının bir çok nedenleri vardır. Ağanın ekonomik yönünden en büyük gelir kaynağı, ikincisi hizmeti, çalışkan ve dürüstlükleriyle bölge ağasının hizmetine koşulan en etkin ana katman sınıf olarak değerlendirilebiliriz. Bölgede gelir sağlayan en değerli zanaatların, el sanatlarının, ticaretin, alış-verişin ustaları bu insanlardı.

Asırlardan beri Kürt halkıyla yanyana içe-yaşıyan bu azınlık etniklerin Kürt halkıyla kaynaştığı; örf, adet, gelenek ve görenekleri iç içe girdiği, çoğu yerlerde ana dillerini dahi unutup, Kürtçeyi ana dili olarak konuşmakları gerçektir. Dini inancı dışında Kürt halkıyla fazla bir ayrılık görülmeyen bu insanların Kürdistanı terk etmeleri büyük bir,

kayıptır. Ermenileri ayrı olarak değerlendirmek gereksiminin bazı nedenleri vardır : Soykırım (Jenosid) a uğrayan 1915 Ermeniler, kendi iradeleri dışında bazı temel ulusal haklarını kaybetmeleri örneğin (toprak birliği) zorunlu bir göçe zorlanmaları vs. gibi. Unutmamak gereklidir ki Türkiye Kürdistanı'nda kesimden kurtulan ve bu gün Avrupa'ya göçe zorlanan Ermenilerin çoğu bölge halkın saklamaları ve korumalarıyla sağlandı. Örneğin Şırnak'ta soykırım olmadı ve bugün Hollanda'ya yerleşen yaklaşık 150 hane ile Belçika'ya yerleşen yaklaşık 50 ha ne soykırımda korunan ve saklanan Ermenilerdir.

Önceleri İstanbul'a gelen gençlerin (Ermeni, Süryanilerin) eğitim görüp yerleşmeleri ve köylerine bir daha dönmeleri ardından aileleri de İstanbul'a çekti. Daha geniş çalışma olanakları bulan bu etnik guruplar daha sonraları Avrupa'ya açılıp çeşitli ülkelere işçi olarak göç ettiler. Yine Avrupa'ya gelen genç öncü işçilerin ülkeye dönmeme kararı vermeleri üzerine, ailelerinde işçi olarak Avrupaya gelip çalışmalarının olanakları bittiğinden toplu dini göçleri ardından getirdi. Hollanda ve İsviçre'ye gi- den ilk göçmen kafilelerinin büyük ilgi gördükleri her türlü yaşama ve sosyal hakların tanındığı ve maddi yönden de büyük yardımlar aldıkları lüks villalarda yaşadıkları, çalışmadan ömür boyu yardım alacaklarını duyan Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nın daki azınlıklar seferber oldular.

Önceleri Belçika'nın SABENA şirketiyle İstanbul-Milano-Brüksel-İstanbul geliş-gidiş turistik aile-biletini alan göçmenler 2inci iniş yeri olan Brüksel hava alanında siyasi iltica talebinde bulunuyorlardı. Üçaya yakındır SABEA'nın devlet düzeyinde uyarılması üzerine göçmen olarak turistleri getirmemeleri, ardından ülkede her türlü varlıklarını yarı fiata elden çıkarıp İstanbul'a gelen göçmen kafilelerini zor durumda bıraktı. Başka yollar aramaya zorlandı. İstanbulda çeşitli simsarlar, aracı ve tefeciler bölgeye akip edip, halkı (gayri müslim Hristiyan azınlıkları) toplu göçe teşvik etti.

Avrupadaki lüks hayatın bir parçasının onlara ayrıldığı, Avrupaya ayak basar basmaz düşen mis evlerin, renkli televizyonların, paraların kendilerini beklediğini, ömür boyu emekli gibi maaşlarını alacaklarını ve Hristiyan alemince korunup hürriyetlerine kavuşacaklarının propagandasına kapılan insanlar her türlü varlıklarını (toprak, ev,

Mal, hayvanlarını vs.) yarı fiata satışa çalışıp bir an evvel bu lüks hayatı kavuşturmak için vilayetlerde pasaport dairelerinin önündü kuyruklar oluşturmaya başladılar. Pasaport almak için de devlete ve memuruna haraç veren bu insanlar İstanbul'a akın etmeye başladılar. İstanbul'da su anda uçak biletlerini almak için kuyruklar oluşturan bu manzaraya cunta hükümeti ve generaller çok seviniyorlar; neymış hırıstıyanlar Türkiye'yi terk ediyorlar, bundan iyisi de mi oluyormuş; saf müslüman Türkiye.

Avrupa'da başgösteren ekonomik kırızla beraber gelişen işsizlik Almanya, Hollanda ve İsviçre'in göçmen işçilere kapılarını kapama sı üzerine, bir tek yol olarak göçmenler Belçikayı buldular.

12 Eylül 1980 de Fasist Cunta'nın işbaşına gelmesiyle Türkiye ve Türkiye Kürtistanı halklarına uygulanan toplu baskı, işkence tutuklamalarдан Ermeni, Süryani, Yezidi'ler de nasibini aldılar. Yukarda anlatmaya çalıştığımız nedenler ve de yazmadığımız diğer nedenlerin üst üste birikmesi üzeri

ne toplu göçler başladı. Hâlâ devam ediyor, Turist sıfaiıyla Avrupa'ya ailece çıkan bu kafilelerin ülkeyi terk etmeləi aynı zamanda faşist cunta'nın işine geliyor. Faşist cunta son zamanlarda İslam ülkeleriyle daha yoğun ekonomik işbirliğine ve anlaşmalara giriyor, zirve toplantıları yapıyor İslamiyetin en büyük ustaları olduklarını göstermeye çalışıyorlar. Elbetteki gayri Müslüman olmayan halis bir İslam ülkesi olmasına hem kendilerinin, hemde İslam Arap ülkelerinin işine geliyor.

Fakat Fasist Cunta'nın en büyük isteği olan ve zaman zaman zorla uygulanan toplu göçler ne kadar uygulansa dahi Kürt halkı o toprakları Cumhuriyet Cuntasına terk etmeyecektir. Kendileri o topraklardan göç etmeye zorlanacaktır.

Kürt ulusu yıllarca en derin bağlarla içice yaşayan Ermeni, Süryani ve gayri Müslüman etniklerin ülkeyi terketmelerini asla istemiyor ve de sevinmiyor. Kardeş Ermeni ve Süryanilerin gücüne alkış tütan Cumhuriyet ve cuntalarının bu sevincini kürsakla rında bırakmaya kararlıdır.

HEVPE YVİN

Derwêş

Berf qend mehan hikûmeta Belçika xwest du girtiyen Başkî ji gitkîgen ha Antwerpen re bîke Ispanya. Ji bo vê yekê pirr komelên siyasi û humâniyat li hember vê yekê rawestan û hikûmet protesto kir. Lê ci mixabe ye ku hikûmeta Belçika ev her du kes şandin Ispanya û li kesf gohdarri ne kir.

Wek tê zanfn li Ispanya kesen polîtik û şoreşgér ji aliye karbidestên Ispanya têñ işkence kirin. Bêhtirin işkence li ser militanên Baskî têñ kirin.

Ji bo ku em hinek bastır li ser mësela Baskan û welatê wan bizanibin, me hevpeyvînek bi du Baskan re kir. Yek ji wan merivek ji çar sazbendêñ rêxistina ETA bû û nuha mamosye, José Manuel Agirre. Ya din militana eniya bi navê Herri Batasuna ye, Lurdes Rosrigues-Landa.

Pirs: Bask kî ne?

Bersiv: Bask ne Fransız in û ne İspanî ne. Gotina Bask hemî jîna me

ye. Gelê Bask yek ji kevtirinê gelên li ser ruyê erdê ye. Lê ci mi-xabe ye kû di dîrokê de tu şansekî vî gelf ne bû. Lê, ez ez im. Ev tê gotina ku Baskîti tiştekî dîrokî ye. Geleki xwedî dîrok, adetên xwe, çanda xwe ku ji gelên dar û dor cida ne. Ew li welatekî ku serê wan pê bilind e dijîn.

Gend nîşeyen giring: maf û pêwistîyên mirovan li cem hemî gelên dar û dorê hatine nivîsandin. Lê Baskî vî tiştefî nas nakin. Ew maf û erkên wan adetî û bi devkî ne. Bask dibêjin "Hîtza hitz", (soz soz e), pêwistîya nivîsandina maf û erkan nîne.

Mafîn hemî gelên li dora me bingehê xwe ji maf û qanûnên Rumen (Roma) werdigirin. Lê yêñ me ji adet û jîna me der hatine.

Gelên din dibêjin "ev mafîn min in", li cem Baskan ne weha ye. Bask dibêjin "mecburîyeten min ci ne?". Ji bo vê yekê em karin nîşeye giring bidin. Di çerxa 9 de nêçîrvanên ku diçün masîyan qismek ji nêçîfra xwe

didian seyən bi xwe ra, Ji ber ku wan jî arıkariya nêçfranan dikir.

Kooperatifên nûka, MONDRAGON, BER-RIA, DENEK, ORHI, ALKI, û hwd. nîse ne ji bo şexsiyeta Baskan. Ew, ji adetên xwe, bi awakî tebîf der têñ. Hevkarî di dîroka Baskan de cihekî giring digre. 'LEHRNA EUSKADI' an jî 'Melîkiyeta NAVARRA' welatê kevn-tirin yê Baskan bi navçeyêñ din re ñi bin eniyekê de (bi rengê konfederasyonê) kar dikir. Ev jî dide xuya kirin ku gelê me her tim bûye alîgirê rengê federalizmê.

Pirs: Sedemên pelixandinê li welatê Baskan çi ne?

Bersiv: Vê pirsê ji kesen ku têñ pelixandin bipirse, weka gelê Kurd !

1- Destpêka pelixandinê li welatê Baskan ji destpêka sazbûna gelê dewletê ye. Ev gelê dewletê dixwaze hemî gelan di bin çarçewa dewletê de kom bike û bike yek gel. Hemî maf, erkên aborî, politik û çandî ji bo menfaetên wî gelê ku dewlet saz kiriye û xwediyê hemî tişti ye. Em ji vî gelî re "gelê dewletê" dibêjin, ku ser bi dest e.

Gelê dewleta Ispanî bi derketina Ereban ji axa Ispanya dest pê kir. Ji hînga ve gelê Castiliyanan ji bo "dewleta yekbûyî" kar kir. Ev jî dibê sedema hundakirina şexsiyeta gelên din (di aliyê aborî, civakî, çandî, ziman, dîrokî) li vî welatî.

2- Sedemek din jî ev e ku gelê me her tim ji bo mafêñ xwe li hember dijmin serî hildaye. Gelên din yêñ bindest vî serrê ku em dikin nakin.

3- Di zihniyeta İpaniyan de karakterî emperyalist heye. Ji ber ku wan di dîrokê de pirr kolonî çêkirin û ev kolonî ji desten wan derketin. Niha jî suravkê xwe ji serê Baskan derdixin. Ji ber ku Baskan qet û qet serê xwe li ber wan xwar nakin.

Lê dîsa em li sedemên pelixandina fizîkî digerin. Ev pelixandina fizîkî bes li Ispanya heye. Li Fransa ev pelixandin psîkolojîk e. Eger em bi rîzê van sedeman bêjîn:

- Çêkirina gelê dewletê
- Gelê me gelekî ji Ispanî û Fransızî cida ye.. Ew li hemberê van mêtîngehkaran serî hildide.
- Hundakirina mêtîngehân Ispanya ku dibe sedemek ji dewleta Ispanya ra, da gelê me bêhtir bipeli-xîne.

Pirs: Ew awayen pelixandinê çi ne?

Bersiv: Ew fizîkî ne, psîkolojîk in, çandî ne, civakî ne, parçekirina a-xa me ye, hundakirina zimanê me ye, aborî ye û hwd.

Welatê me kirin du parçe. Niha jî dewleta Ispanya dixwaze ku sînorekê di nava sê navçeyen "otonom" û navça Navarra re bikşîne. Ev jî ku gelê me ji hev xerîb bihêlin û weha wî qels bikin.

Her du dewlet dixwazin ku kooperatifên me iflas bikin, ji bo ku gel ji wan pirr dilxwes e.

Dîroka Baskan dîrokeke kevn e. Lî mixabe ev her du dewlet dixwazin vê dîrokê bi gelê me bidin jibîrkirin. Ispanya û Fransa dixwazin ku dîroka me ji alîkf ve jî bi çewti bê nasîn ku ew bi hêsanî serdestiyê li ser gelê me bikin. Ew, di jîna rojê de dîroka xwe, di dibistanan de, rojnaman de, dîroka xwe fêhrî me dikin. Ev dîrok jî li ser mêtîngehkarîya wan, qetlîamân wan û nebaşiyen wan e. Her du dewlet dixwazin ku di demeke kurt de çanda me hunda bibe. Ew qatilên çanda me û adetên me ne.

Ji bo me axaftina bi zimanê me, Basîkî, serbilindayî ye. Lî antî-propaganda wan li hemberê zimanê me li cem pirr kesan kompleksan çêdike. Ew dixwazin me ji gelê me xerîb bikin. Ew dixwazin şexsiyeta me biçûk bikin. Ev tiştekî pirr zor e. Ev barbarizm e. Tiştên ku ew dikin wehşiyet e.

Kesen politik ji aliyê dewleta Ispanî têñ pelixandin, fîskence kirin. Ew taqîb dîbin. İskencêñ Guardia Çiyîl, polisê İspaniyan tiştekî pirr naskîrî ye. Di yê çerxa 20 de, li Ewrupa işkence dîbe. Ev fîskence li ser gelê Bask li welatê Bask dîbe. Ev qas jî ji ber ku ew Bask in, ji ber ku ew di hemberê wehşiyetê û neheqiyê ne.

Pirs: Hün çawa li hemberê vê pelixandinê û neheqiyê derdikevin?

Bersiv: Ev pirsa te pirseke giştî ye, lê em karin ji bo vê yekê 5 noqtîn eniya Herri Batasuna pêşan bikin. Di eniya Herri Batasuna de, sendîke, partiyen siyasî, komelên xwendekaran, yekîtiyên karkeran, jînan, xortan û komelên çandî hene.

1- Hêzên mêtîngehkar pêwist e ji welatê me der biçin.

2- Efuya giştî, ne bes serbestberdanna girtiyan, lê ew cizayên ne insanfî pêwîst e rabin.

3- Mafê otonomiya welatê Baskan.

4- Baškirina şertên xebatê ji bo karkeran.

5- Pêwîst e zimanê Baskî li welatê Baskan bê axaftin û bibe zimanê resmî.

Eger Madrid li ser van pênc noktan bixwaze biaxive, ETA jî dixwaze dev ji êrifşen xwe berde.

Em dixwazin ku 7 navçeyên welatê Baskan bibin yek û di hemî aliyân de xwedî gotin bin. Di aliyê aborî û civakî de pêwîst e gelê me biryarê bide. Em dixwazin ku li welatê me modeleke Marksîst ava bibe lê ev model pêwîst e ji aliyê gel bixwe bê ava kirin û çêkirin. Li gora fîmkanen xwe û şertên xwe ev tişt pêwîst e saz bibe.

Xebata me? Em bi rengekî tebfî li hemberê pelixandina gelê xwe xebatê dîkin. Kooperatif, Ikastolas (dibistanen) ku Baskî bi xwe ava dîkin û bi diravên xwe xebatê dîkin. Dewlet ti diravekî nade ji bo van dibistanan, kursen alfabetîzasyonê ji bo girgi-rekan (kesen bi emr). Ev qas tişt bi fîmkanen me bixwe dîbin dijîn. Li welatê me, şerrê me yê çekdarî tiştekî pêwîst e, li hemberî yan zorbe û îşkenceciyan.

Pirs: Çima hûn bi rîexistinên çep yê İspanî û Fransiz re.xebatê.nakin? Ji yekftiyê hêz derdikeye?

Bersiv: Ev pirr hêsan e. Ev şerrê me di nav bera du gelan de ye. Gelek jê gelê din diperçiqne. Rîexistinên çep yê Fransizî û İspanî arîkariya wê mîkanîzma dewletê û leşker dîkin ku vî gelf bipelixînin. Ew pêşin Fransiz û İspanî ne, paş re çep in. Ew, çepen ku menfaetên dewletên Fransa û İspanya diparêzin. Ji ber vê yekê em dibêjin, xebata bi arîkarên zorba re na. Çepitiya wan ji bo tiştekî ku em li ser minaqesê bikin e. Dema ku hin rîexistin çep bin nayê wê gotinê ku ew ne emperyalist in. Nuka li du hêzên çep, hêzên "sosyalist" li van her du dewletan temâse bike, li firaza wan binêre. Ew gi dîkin li dinê li hemberê gelên din de. Ew gi dîkin li hemberê gelê me. Ji welatiyên xwe yê rast, berpiş-siyarîn zengîn ên xwe bêtir me dipe-lîxînin. Ev gotina yek ji wan kesen parazkarê dewleta İspanî ku hêza

rast temsîl dike naskirî ye: "İspanyake sor ji İspanyake perçebûyi baştir e".

Leşkerê van her dewletan bi welatiyên xwe, hêzên çep, yanî karbidestenî fro qayil in û ji wan memnûn in.

Hêzên çep parçebûna dewleten İspanya û Fransa naxwazin. Ew yekbûna welêt û "yekbûna" hêzên "çep" dixwazin. Dema em li ser welatê xwe diaxîvin ew tore dîbin, ji ber ku em parçebûna dewletê dixwazin. Lî ji nizanim çend çerxan ve wan welatê me parce kirine û di bin desten wan de ye û li ser vê yekê jî pêwîst e em devê xwe bigrin. Pêwîst e em li wan bihisînin û dengê xwe nekin. Pêwîst e em ji "welêt" re xebatê bikin. Hînga ewê razî bibin ku em xebata siyasi dîkin. Lî dema em ji bo welatê Bask û gelê Bask xebatê dîkin ew tore dîbin. Ew dibêjin, parçebûn na, lê ew bixwe jî me parce dîkin û em nikarin li hember jî derkevin. Çawa eme bi yan şoystan re kar bikin? Ev rews li cem we jî weha nîne? Li Kurdistan jî ev rews weha ye. Kîjan rîxistina gelên serdest yêndewleten ku hûn parce kirine dixwazin dewletteke Kurdan di rex dewleta wê dê ava bibe? Qet bawer meke. Ew menfaetên dewleten xwe diparêzin. Pêwîst e em di siyaseten xwe de ne weha saf bin. Pêwîst e çavekirî bin.

Pirs: Çend gotin li ser Otonomiyê li welatê Baskan?

Bersiv: Otonomiya fro tiştekî ne rast e. Belkî ji bo çend kesan başbe, ji bo ku ew xwe zengîn bikin. Lîne ji bo gel. Lî otonomiya fro ji bo dewleta İspanî fîdeke mezin e. Ev otonomiya ku dane me xapînok e û me pê dixapînin. Eger em li ser otonomîke rast biaxîvin tê gotin ku em ji hemî gelên bindest re wekhevî dixwazin. Ji bo Baskan, Katelalan, Galisiyan û hwd. em otonomîke rast bi can û dil dixwazin. Lî ew wê yekê naxwazin. Ji ber ku otonomîke rast ji bo me rîça serxwebûnê ye. Ew ji me ra wê bibe dergahê azadiya gel û welatê me.

Dewleta İspanî vê otonomiya derewin dide me ji bo ku ya rastî di salen pêş me de nede me. Otonomiya fro weka derziya li hemberî tîfus de li meriv dixe. Lî ew bixwe jî bi vê yekê baş dizanin. Çawa em karin li ser otonomîke weha bi şîwekfî baş biaxîvin eger ji bo her 120-150 kesî l polîs li welatê me amade bibe? Li

DÛMAHIYA RÛPEL 3

De werin em jf vê bikin. Em jf guh bidin huner û edebiyata xwe, pişt-girtî ji alîkariya nivîskarêñ xwe bikin û edebiyateke kurdfî ya nemir biafirînin.

DÛMAHIYA RÛPEL 11

anîn. Sifir ku li Ergani, Diyarbekir û Palo tê derxistin (32.000 ton), li navçeya Akra jf tê dftin. Krom li welatê Barzan û li Diyarbekrê ku ew li wira tê derxistin (270.000 ton di salê de) tê dftin. Resas li Keban, Elazig û Maku; zêr li Yergu û li Başûrê Kermanşahê; zîv li Kemahê, hene. Li Kerkükê tê gotin ku bi xêra xweyê xam çêkirina sûdê kostik û klor ewê mimkin bibe. Lê, dewlemen-diya mezintirîn a Kurdistanê petrol e. Petrola Kerkükê ji hundurê welatê kurdfî dipijiqe û pareke mezin ji produksyona Iraqê ava dike (83 mil-yon ton di 1970 de). Weka wê jf, petrol li Batmanê, li navçeya Siirtê û bfrêñ Karaçok li Bakurê Sûriyê hene. Gazê tabî li navçeya Çamçama-lê, pirr e û tê de kibrît tu neye.

Dûmahî heye

DÛMAHIYA RÛPEL 23

gotin:

- Baz mede, di cihê xwe de raweste!

Mêrik reva xwe domand. Kirfî bigihîş-ta serê kuçê, leşkeran lê tegandin. Mêrik li ser piştê li erdê ket. Ji her derê wî xwînê pijiqand.

DÛMAHIYA RÛPEL 27

qede. Ji bo hemî tiştî dibêje şerr e. Baş e, eger şerr qediya, ew xelk ewê hemî heqîn xwe bixwaze û hikû-meta İranê jf nikare hemî tiştan bi-de wî û çêke. Sebebê şerr ê din: leşker li hidûd (sinor) e. Piştî şerr ewê bizivire. Weka ku di tarî-xê de derbas bûye, ewê ji bo xwe tiştan bixwazin. Xumeynî wan (leşker) ji bajaran dûr xistiye ku da-xwaziya tiştîk nekin. Xumeynî bi xwe gotiye: "Heta ku Saddam hebe, em şerr dîkin". Eger Xumeynî şerr bise-kinîne ewê ji gelê xwe re ci bêje?

DÛMAHIYA RÛPEL 31

Güney wê rojê nehiştin ko kesê girtîya ji keştiyê derkevin û herin kesê xwe yî girtî bibînin. Wê rojê Yilmaz Güney ji girtîxana İmrali rakirin, birin girtîxana Isparta. Çend miha li wir ma. Min wan nivî-sandinê ko amade kiri bû, jêra şiyand Isparta. Li wê girtîxanê senaryoya ÇîYA qedand. Min ew senaryo û Yilmaz Güney nedît. Lê ew senaryo hat qedexekirin. Mefer nedan ko filma wê senaryoyê çêkî.

Piştî çend miha min bihîst ko Yilmaz Güney ji Tirkî derket. Piştî min bihîst ko xelata zérîn i CANNES sitand. Di payda jî min bihîst ko cihê xwe yî hêja vala, situwê gelê xwe di pay xwe de xwehr hîst û çû dîlovanîya xwe. Ez bawerim ko navê Yilmaz Güney di nav Kurda de wê her bijf.

SAYFA 34'ÜN DEVAMI

Seyahat

-Residence in Koordistan, C.J.RICH, London, 1836
Din

-Le ZEND-AVESTA (3 cild), James DARMESTETER, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1960

DÛMAHIYA RÛPEL 38

Almanya Naziyan, di dewra Hitler de, ji bo her 310 kesan 1 polis hebû. Rewşa me ji wê dewrê jf xirabtir e. Otonomiyên weha kesf bihîstiye? Otonomî li vira nîne. Li vira welateki işgalkirî heye. Li beşê bakur jf, Mitterrand naxwaze li ser tiştîkî weha ji bo Baskan biaxive. Basken li wira dixwazin ku berpirsiyarêñ xwe hilbijêrin, lê dewleta Fransa vê ye-kê qebûl nake.



